# Welatê Me

ROJNAMEYA HEFTEYÎ — SAL: 1 HEJMAR: 20 — 2 AVRÊL 1995 — BUHA:25.000 TL(KDVD)

## Nivîskar jî ambargo datînin

Nivîskarê bi nav û deng Johannes Mario Simmel, pirtûka xwe ya nû,"Bilbil di biharê de dixwîne" nehişt ku li Tirkiyeyê were weşandin. Wekî sebeba vê yekê jî qetlîem, îşkence, girtîna rojnamevan û rewşenbîran, girtina bi hezaran mirovî, perçiqendina mafên mirovan, sansur û hwd. nîşan da.

**Rûpel 3**

## Emê heqê xwe bistînin

Dibe ku van rojan şehîdên me jî çêbin. Gelekî jî wan xwîn diavêjin. Çawa ew li wê derê berxwedana xwe dikin, emê jî li vê derê bikin. Nebû emê herin Enqereyê ba serokomar, serokwezîr û wezîrê dadê. Eger zarokên me mafên xwe nestînin, em tiştek safî nekin, emê rasterast herin Konyayê li ber girtîgehê emê dohn li xwe bikin û xwe bişewitînin.

**Rûpel** 4

## Lîteraturê li Mezopotamyayê dest pê kiriye

Lîteratur, gotineke latînî ye ku tê wateya herf, anku tîp. Di bingeha xwe de ji peyva "littera" tê. Lê beriya hebûna vê peyvê û wênenivîsiyê (Sîstema nivîsîna Someran) lîteratur, di forma çîrokên devkî, stran û nivîsarên dadî (hiqûq) de hebûye.

**Rûpel 11**

## Artêşa Alman jî şerê qirêjî meşandiye

Kirinên artêşê jî ne kêmî kirinên naziyan in. Wek mînak ji fermanameyan mirov hîn dibe ku wan ji bo her leşkerekî ku partîzanan li Yugoslavyayê kuştiye 100 gundiyên sivîl, ji bo yekî ku birîndar bûye jî 50 gundî kuştine.

**Rûpel 5**




**Artêşa tirk li başûr sivîl û zarokan dikuje**

# WÊ BAŞÛR LI ARTÊŞA TIRK BIBE VÎETNAM

● Îşgalkirina başûrê Kurdistanê ya ku 19'yê adarê artêşa tirk dest pê kir, di heftiya duyemîn de dewleta tirk xiste rewşeke xerab. Artêşa tirk di şertên Başûr de li hemberî hêzên gerîla nikare li ber xwe bide û her roj bi derbeyên pir xedar ên gerîla yekîneyên tirk ji hev belav dibin.

● Ji niha ve ji aliyê moral û psîkolojiyê ve yekîneyên tirk ketine rewşa leşkerên amerîkî yên dema şerê li Vietnamê. Ev rewş ji aliyê rojnamevanên tirk ve jî tê îtîrafkirin. Li gorî pisporên siyasî di şertên Başûr de tu şensê artêşa tirk tune ku li hemberî gerîla demeke dirêj xwe rabigire.

**Rûpel 2**




## Tu bi xêr hatî MED TV

● MED Tv'yê şeva 30'ê adarê dest bi weşana ceribandinê kir. Şeva pêşî bi muzîk û dîlanê weşana MED Tv'yê sê saet dom kir. Kurdên çar aliyên dinyayê ji ber MED Tv'yê ketin nava kêf û şahiyeke mezin.

**Rûpel 2**

Endamê Komeleya Danasîna Çanda Hacı Bektaş-ı Veli Hıdır Doğan:

## Li Tirkiyeyê her tişt formalîte ye



Hıdır Doğan

● Divê zîhniyeta dewletê biguhere. Divê nêrîna wê ya der barê gelş û gelemşeyên li welêt biguhere. Îro li aliyekî welêt xwîn tê rijandin, li aliyekî mirov bêdarizandin (bêmehkemekirin) tên kuştin, li aliyekî îşkence li mirovan tê kirin.

● Pir ecêb e. Wezîrê ji Mafên Mirovan Berpirsiyar (yê berê) Azimet Köylüoğli radibe, dibêje ku li Tirkiyeyê 18 celebên îşkenceyê hene. Serokwezîr Tansu Çiller jî radibe dibêje ku wê îşkencekirinê ji holê rake.

**Rûpel 8–9**

www.arsivakurd.org

**Di heftiya duyemîn a îşgalkirina başûrê Kurdistanê de pisporên siyasî wiha gotin:**


# 'Wê Başûr li artêşa tirk bibe Vîetnam'

Di destpêka heftiya duyemîn a îşgalê de roja 27'ê adarê artêşa tirk çûn û hatina Başûr li hemû rojnamevanên biyan û tirk qedexe kir. Di rojên dawî de hêzên dewletê bi wesîteyên leşkerî rojnamevanan ji bakurê Kurdistanê jî dertîne û ber bi rojavayê Tirkiyeyê ve dişîne. Li aliyê din rayedarên dewleta tirk teklîfa hevkariya îşgalê ji rayedarê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê re birin da ku karibin artêşa tirk ji rewşa xerab xelas bikin.

Artêşa tirk di heftiya duyemîn a îşgala başûrê Kurdistanê de dev ji pesin û fortên xwe yên rojên pêşî berdan û hêdî hêdî dest bi vekişadina hêzên xwe yên îşgalker kir. Li gorî agahiyên ku ji Silopî û ji Zaxoyê gihane me, artêşa tirk di roja 10'an a îşgalê de ji bêmecalî hin hêzên xwe ji Başûr ber bi Bakur ve vekişandin. Çavkaniyên herêmê didin zanîn ku vekişîna artêşa tirk ji Başûr bi qasî ketina wê hêsan çênabe. Dema ku hêzên xwe vedikişînin, bi taybetî jî bi şevan li êrîş û kemînên gerîlayên ARGK'ê diqelibin û ji ber vê yekê ji aliyê psîkolojiya xwe ve leşkerên tirk dikevin rewşeke pir xerab.

Li gorî nirxandinên pisporên siyasî vekişîna artêşa tirk, piştî wan îdia û hedefên dagirker, ji fiyaskoyeke siyasî û têkçûneke leşkerî pêştir nayê maneyeke din. Tê gotin ku ku artêşa tirk ji ber hêrsa serneketinê giraniya xwe dide kuştina kesên sivîl, şewitandina gundan û îşkencekirina kesên welatparêz.

Li gorî agahiyên ku ji aliyê ofîsa çapemeniyê ya qerargeha ARGK'ê ve roja 28'ê adarê ji hemû saziyên navneteweyî re hatine şandin, gerîla derbeyên mezin li yekîneyên artêşa tirk dide. Li gorî vê daxuyaniyê bîlançoya şer a heşt rojên pêşî wiha ye: Di pêvajoya heşt rojan de li gelek niqteyan 69 caran di navbera hêzên ARGK û yên artêşa tirk de şer derketiye. Di van lihevxistinan de 516 leşkerên tirk û 21 gerîla hatine kuştin. 12 heb jî sivîl ji aliyê hêzên dewletê ve hatine qetilkirin. Daxuyanî dîsa dide zanîn ku gelek leşker di kemînên gerîlayan de, bi teqînên mayînan hatine kuştin lê agahiyeke tekûz der barê hejmara van de nehatiye standin.



Ev 70 sal in Kurdistan di bin îşgala artêşa rom de ye.

Di roja 11'an a şer de ji aliyekî ve artêş hin hêzên xwe bi paş ve vedikişîne, ji aliyekî ve jî li gelek niqteyên Başûr şer berdewam e. yekîneyên artêşa tirk yên ku li hin niqteyên mintiqeya Metîna cih girtibûn bi êrîşên gerîla nema xwe ragirtin û ew mintiqe terk kirin. Ji mintiqeya Amediye jî artêşa tirk tenê li devera Enîşkeyê dikare bimîne. Hêzên tirk dema ji devera begovê jî vekişiyan li êrîşên gerîla qelibîn, gelek leşker hatin kuştin. Li mintiqeya Begalte jî gerîla ji sê milan ve êrîş birin ser konên leşkeran û gelek ji wan kuştin. Li aliyê din şerekî mezin li çiyayên Zagrosê di navbera her du hêzan de derket. Di wê navê de Bablîsok û bager rabû, artêşa tirk nekarî yekîneyeke xwe ya ji 150 leşkeran pêkhatî bi paş ve vekişîne û zehfê wan qerisîn. Li nêzîkî Haftanîn û Derya Şîn jî gerîla bi êrîşên giran zêdeyî 20 leşkerî kuştin.

Di şerê Başûr de ji xeynî cerdevanên Bakur gelek pêşmergeyên PDK'ê jî alîkariya hêzên artêşa tirk dikin, bi taybetî jî di pêşiya hêzên tirk de li Zaxoyê mal bi mal digerin da ku welatparêzên li dijî îşgalê tesbît bikin, bikujin an jî tehdeyê li wan bikin. Reaksiyona gelê Başûr her diçe li hemberî îşgalê û pêşmergeyên hevkarên artêşa tirk, zêde dibe. Li aliyê din li gorî agahiyeke ku gihîşte me, lê rastiya wê nehate teyîdkirin, artêşa tirk bi darê zorê zêdeyî hezar penaberên Bakurî ji Başûr vegerandine bakur.

**Navenda Nûçeyan**

## Tu bi xêr hatî MED TV

Televîzyona kurdî MED TV'yê dest bi weşanê kir. Êvara roja 30'ê adarê pêvajoya sê saetan bêrawestîn weşana testê (pexşa azmûnî) pêk anî. Weşan li gorî saeta Tirkiyeyê di navbera saet 7 û 10'an de (19.00–21.00) hate pêşkêşkirin. Li gorî agahiyên ku me bi dest xistin, Televizyona MED'ê şeva yekemîn a weşanê li hemû welatên Ewrûpayê, li Komarên Sovyeta berê, li Tirkiyeyê, Kurdistan û gelek welatên Rojhilata Navîn û herêma jora welatên Afrîka hatiye temaşekirin. Kesên ku di avahî an jî xaniyan de antêna çanak heye, bi hêsanî MED TV seyr kirine. Ji gelek welatên Ewrûpa û çend deverên Kurdistanê û Tirkiyeyê gelek kesên kurd li me geriyan û dan zanîn ku weşana testê ya MED TV'yê seyr kirine. Weşana MED TV'yê di nav kurdan de bû sebeba kêf û şahiyeke pir mezin. Lê hêzên dewletê jî ji bo kirinên xwe yên dij–mirovî hinceteke nû dîtin. Li gorî agahiyê ku ketin destê me li Madenê, polîsan avêtine ser Tesîsên Bêhnvedanê yên Gola Hezarê yên Belediyeya Madenê ku mirov li MED TV'yê temaşe dikin û xwediyê tesîsan girtine bin çav.

MED TV'ê di weşana testê ya yekemîn de cih da bernameyên folklor, muzîk û dengbêjan. Di pêvajoya sê saetan de ji xeynî folklor û muzîkên gelêrî, li muzîsyenên navdar ên kurd Ciwan Haco, Nasir Rezazî, Serhat û Eylem di ekrana MED TV'yê de hatin temaşekirin û guhdarîkirin.

MED TV'yî çend stranên tirkî jî pêşkêşî temaşevanan kirin. Weşan di şeva yekemîn de %80 bi kurdî bû. MED TV bi hemû zaravayên kurdî wê bernameyan çêbike, feqet giranî wê li ser zaravayê kurmancî be.

Televizyona kurdan MED TV, bi wesîteya peykê (satletê) weşanê dike. Navenda MED TV yê li welatekî Ewrûpa ye û tê gotin ku ne mumkûn e ji aliyê dewleta tirk ve rê li ber bête girtin.

Li ser weşana ceribandina şeva yekemîn em li navenda MED TV'ê geriyan ji bo agahî standinê, feqet rayedarên televizyonê ne xwestin di vê gihanekê de der barê kar û barê televizyonê tiştekî ji me re bibêjin. Yek ji rayedarên MED TV'yê da xuyakirin ku wê di demeke nêzîk de hemû raya giştî ya dinyayê ji kar û barên televizyonê agahdar bikin. Tê gotin ku weşanên ceribandinê yên MED TV yê wê nêzîkî mehekê bidome, dû re jî wê dest bi weşanên birêkûpêk û bibername bike.

MED TV li ser frekansên 1575'an û di rêza peykên televizyonên Star, Atv (Tirkiye), RAT–1, RAT–2 (Îtalya), TVE (Îspanya) û RTP (Portekîz) weşanê dike.

Weşanê MED TV'yê di şeva yekemîn de bi qasî televizyonên din ên navdar, zelal bû. Xwendevanekî Welatê Me yê ku MED TV seyr kirîbû bi telefonê wiha got: "Êdî televizyona me jî heye, dewleta tirk bêminet e."

## Doşdamanî tirk

**(Soranî)**

Dway ewey hêzekanî dewletî tirk bê reçawkirdinî hîç merc û peymanêkî nêwdewletî û be biyanuy parastinî sinur û tawandinewey hêzekanî Partî Kirêkaranî Kurdistanewe, hêrişyan kirde ser başurî Kurdistan, be danpêdananî xoyan ziyatir le 40 km çunete jurewe. Aşkira ye, ke em çune jureweye zêdetir e û pêdeçê hengawî tirîş binên, be taybetîş berew ew nawçaney ke le jêr kontirolî hêzekanî YNK dan. Diyar e bo emeşyan biyanuweke ewe ye, ke hêzekanî PKK berew ew nawçana helatûn.

Lê katêk da hemû dinya çawî le ser em şere û ew berencamane ye ke lem şere da dêne arawe û le katêk da ke zor le nawende siyasî û kese çawdêrekan be xalî werçerxandinî dezanin le rewşî em roy Dewletî Tirk û Şorişî Kurdistan da, a lem kate nasik û qonaxe tirisnakey ke bizutnewey kurdayetî piya da derbaz debê, hêzekanî başur dîsanewe dest le şerî kurdkujî ber naden, dîsan be helwêstî napak û xiyanet kariyewe xwênî gelî kurd herzan firoş deken. Belê le katêk da ke hêze şorişgêrekanî bakur le germey xebat, şer û têkoşan dan û dexwazin em hêrişey tirk be sudî Sinûr sirînewe û des le milanêy başur û bakur bigêrinewe, hêzekanî YNK û PDK, carêkî tirîş sînaryoy mergesate mêjuyekanman dûbare dekenewe.

Rengdanewey em hêrişey tirk be corêke ke le sercem dezga rageyandinekanî dinyawe (ger mirov be wirdî gwê helxa) ewey bo aşkira debê ke hêzî serbazî û siyasî tirk çend le astî meseleke da damaw û destewejno ye.

Bêguman dezgakanî rageyandin çend le baskirdinî hêzekanî PKK da hîsab bo meseley kurd deken, du ewendeş le baskirdinî şer û kurd kujiyekey YNK û PDK da, meseleke be naxî zewî da deçeqênin.

Pîlan û gelekomekêke zor le we firawan tire ke le rageyandin da amajey bo dekrê. Diyare ewe xoy bo xoy wire û bawer be xobûnêkî mezin be hêzekanî PKK debexşê, herweha hîsabî dewletêkîşî bo kirawe. Piştgîrî, yan bêdengbûnî Rojawa û bê dengî dewletî Iraq û Iran çemkêkî mezinî ew pîlane berfireyen. Belam le gel hemû amanaş da Turkiya û yaranî hak dezanin encamî em (haybext) eş her mayepuçî ye.

Le jimarey rojî 30.03.1995 î rojnamey El–Hayat da, berêz Mahîr Osmann derbarey şereke gutarêkî nûsîwe û le peregirafêkî da wa delê: Zor zehmete em karey KT deykat, ke eme gewretirîn çalakî serbaziyan e le dirust bunî KT ewe, bitwanêt çok be PKK da bidat, yan hîç nebê lawazî bikat. Le encamî ew hêrişanewe Ankara ne tenya hes be ziyanî sedan milyon dolar û darimanî ziyatirî bingey aburî xoy dekat, belku hest dekat ke peywendiyakanîşî le gel Yekiyetî Ewrupa da berew girij bun deçê, ke demêke bê piçranewe be hîwa ye bibê be endamî, yan le ser hendê şit le gelyan da rêkbikewê.

**PISMAM**




# Çapemeniya Ewrûpayê ji bo îşgala Başûr çi got?

**Çapemeniya derve tevgera artêşa tirk wekî îşgal bi nav kir. Nûçeyên ku di van rojnameyan de derketin, didin zanîn ku dewleta tirk karekî li derî hiqûqa navneteweyî û li dijî mirovahiyê kiriye. Ew, şerê ku li dijî gelê kurd tê meşandin ji wekî jenosîdê bi nav dikin û balê dikişînin ser çareseriya siyasî.**

İTALYA

**II Manifesto**: Qirkirina sedsalê ya dawî dest pê kir; tirk heta kurdê dawî jî nekujin, naseknin. Armanca komara tirk îlhaqa başûrê Kurdistanê ye. DYA jî dibe şirêkê vî sûcî.

**Le Stanpa:** Li başûrê Kurdistanê kurd tên qetilkirin; Leşkerên artêşa tirk li başûrê Kurdistanê qetlîem û talanê dikin.

**ANSA(Ajansa Nûçeyan):** Serokkomar Îtalyayê ji ber serdana xwe ya Tirkiyeyê e êşiya.

YEWNANÎSTAN

**Ta Nea:** Yekîtiya Ewrûpayê ji Çillerê agahî xwest; Êrîş û zilma komara tirk, ji dinyayê portesto distîne.

**Apoyevmatini:** Tirk dikujin û dişewtînin; artêşa tirk li başûrê Kurdistanê kurdên sivîl û penaberan dikuje.

**Elefterotypia:** "Emê salekê li başûrê Kurdistanê bi mînin"; Dewletên dinyayê li hemberî îşgala artêşa tirk dengê xwe bilind dikin. Bêdengiya Atîna didome.

**Eleftheros Typos:** Iraq ji hereketa Tirkiyeyê memnûn e. Leşkerên tirkan sivîlan dikujin.

FRANSA

**Le Figaro:** Sûcê bêqisûr; bi alîkarî û veşartina çapemeniya tirk, artêşa tirk başûrê Kurdistanê îşgal kir. Komara tirk kurdan qir dike û rêç nahêle.

**Liberation:** Yekîtiya Ewrûpa li hemberî operosyonê ye, lê operasyon didome.

ALMANYA

**Franfurter Rundschav:** Pirsgirêk bi bombeyan safî nabin; Serok Wezir Çillerê soza xweya berê ji bîr kir û bi qirkirinê dixwaze pirsgirêka kurdan çareser bike.

**Die Welt:** Kurd û hiqûqa dewletan; Bexda li hemberî îşgalê bêdeng ma, îşgalê wekî qedandina karê xweyê nîvcoyî dibîne.

İNGILÎSTAN

**The Gurdian:** Bombekirin ne çare ye; Komara tirk ne tenê tecawûzî erdê cînarekî xwe kir. Tecawûzî, "Herêma Ewle" ku di bin parastina Neteweyên Yekbûyî û Yekîtiya Ewrûpa de ye jî, kir.

**The Times:** Ewrûpa ji ber sivîl û penaberên kurdan ditirse; Îngilistan û Almanya piştî êrîşa artêşa tirk ditirse ku dubendî bikeve nav NATO'yê. Li gorî analistên leşkerî artêşa tirk a mezin û giran, li hemberî hêzên ARGK'ê yê bimanevra û sivik nikare tu tiştî bike.

**Navenda Nûçeyan**

# Nivîskar ji ambargoyê datînin ser Tirkiyeyê


**J. Mario Simmel**

Nivîskarê bi nav û deng Johannes Mario Simmel, pirtûka xwe ya nû,"Bilbil di biharê de dixwîne" nehişt ku li Tirkiyeyê were weşandin. Wekî sebeba vê yekê jî qetlîem, îşkence, girtîna rojnamevan û rewşenbîran, girtina bi hezaran mirovî, perçiqendina mafên mirovan, sansur û hwd. nîşan da.

Pirtûkên J. Mario Simmel, ji aliyê Onk Ajans ve li Tirkiyeyê tên çapkirin. Piştî vê qerara nivîskarê bi nav û deng xwediyê Onk Ajansê Osman Karaca, ji nivîskar re nameyekê dişîne û tê de dibêje,"We di 12'ê îlonê de pirtûkên xwe da weşandin. Lê hûn vêga nadin weşandin. Ev yek wê xwendevanên we biêşîne." Li ser vê yekê jî Simmel ji Karaca re bersiveke dişîne û dibêje," Piştî 12'ê îlonê, me bawer dikir ku wê Tirkiye di demeke kurt de derbasî demokrasiyê bibe. Lê ev bawerî gelek bi dilekê saf bû. Ev yek tu caran çênebû. Min der heqê Tirkiyeyê de jî gelek cihan û ji Amnesty Internationalê û ji Komiteya Nivîskarên Di Girtîgehê de ya PEN'a Alman agahiyên rast standine. We, ji min pirsiye ku min çima pirtûkê xwe di dema cunta de daye weşandin û we gotiye ku emê nikaribin bersiva we bidin û hûn ê bi vê yekê xembar bibin. Lê tiştê ku mirov xembar dike rewşa welatê we ye. Ku vê gavê rewşa wî ji rewşa cuntayê jî girantir e. Îro komara tirk li ser kurdan qetlîemê dike û nahêle ku kesên demokrat dengê xwe derînin. Ewê dengê xwe dertîne an tê kuştin û an dikeve zindanê. Bi hezaran kurd bi sebebên siyasî girtî ne. Bi sedan rojnamevan û rewşenbîr ji bo fikr û pirtûkên xwe girtî ne. Mafên mirovan di bin piyan de ne. 151 bendê sansurê di qanûnên we de hene û hwd. Heta rewşa dewleta we ev be, ez pirtûkê xwe li Tirkiyeyê nadim weşandin. Û ez bawer im ku wê xwendevanên min jî heq bidin min."

**Navenda Nûçeyan**

## KURTENÛÇE...KURT

### Li Başûr avabûna YNDK

Li başûrê Kurdistanê Yekîtiya Neteweyî Demokrat a Kurdistanê weke alternatîveke nû ji bo tevgera şoreşgerî hat avakirin.

Di daxuyaniya xwe de YNDK baweriya xwe bi yek parçeyî ya axa Kurdistan, piştgirtina şoreşa bakur û li hemberî westandina dagirkeriya Tirkiye dide eşkerekirin. YNDK ew kes û hêzên ku bi dagirkerên Kurdistanê re peywendî darin û parastina Hikûmeta Federal a Başûr nakin, tawanbar dibîne. Herwiha ji bo armancên gelên kurd ku bi ya wan rizgariya neteweyî û damezrana dewleteke demokrat û serbixwe ye, xebatên xwe yên aştî û çekdar didin meşandin.

**Welatê Me/Berlîn**

### Gerîlayan di kontrola rê de 8 cerdevan kuştin

Riya di navbera Midyad û Mêrdînê de roja 24'ê adarê ji aliyê gerîlayên ARGK'ê ve hate birîn. Gerîlayan di kontrola rê de 8 cerdevan kuştin.

Di 24'ê adarê de gerîlayên ARGK'ê bi roj riya Midyadê û Mêrdînê birîn. Gerîlayan piştî birîna rê nasname kontrol kirin û 8 cerdevanan gulebaran kirin û kuştin. Di nava van kesan de sercerdevanek jî heye. Li gorî agahiyên ku ketin destê me, hêzên dewletê livbaziyê dibihîzin lê, ji tirsa kemînê newêrin mûdahale bikin.

### Yekîtiya Ereban Tirkiye protesto kir

Yekîtiya Ereban piştî operasyona artêşa tirk ya li başûrê Kurdistanê, daxuyaniyek weşand. Yekîtiya Ereban di daxuyaniyê de, operasyona artêşa tirk wekî îşgalê bi nav kir û derhal vekişîna leşkerên tirk xwest. Li gorî daxuyaniyê, Tirkiyeyê bi vê kirina xwe, hiqûqa navneteweyî û qerarên navneteweyî perçiqandine û ew nedane berçav.Yekîtiya Ereban, dide zanîn ku, ew yekbûna erdê Iraqê diparêzin û li hikûmeta tirk bang dikin ku, di demeke kin de artêşa xwe ji erdê Iraqê vekişîne.

### Greva birçîbûnê di roja 45'an de

Malbatên girtiyên Konyayê bi daxuyaniyekê, zilm û pêkutiyên li ser girtiyan, protesto dikin û ji raya giştî alîkariyê dixwazin.

Tê gotin ku, ji ber neheqiyên rayedaran, 258 girtiyên Konyayê beriya 45 rojan dest bi greva birçîbûnê kirine û ji dilên di grevê de, Abdullah Demir, Turan Kaya, Hasan Çoban, Mehmet Garip Yaş, Celal Tüken, Vedat Ateş, Abdurrahman Kaya, Ayşe Çabadak û Eylem Zanay Adıbelli ji aliyê tenduristiyê ve di rewşeke xerab de ne. Gelek ji wan xwîn diavêjin.

Navên **10** kesên ku di xaçepirsa hejmara 18'an de peyva veşarî **'Newroz'** dîtine û pirtûka **"Bi kurdî navên mirovan"** qezenc kirine:

**Erkan Kar**
**Bodrum**

Eyyüp Demir
Ankara

**Yavuz Yeşildağ**
**Balıkesir**

Î. Omerî
Qoser/Mêrdîn

**Felat Öncü**
**Çinar/Amed**

Fehmi Kaş
Nisebîn/Mêrdîn

**Rüstem Yılmaz**
**Êlih**

Cemil Bilgiç
Edirne

**Diljan Musiki**
**Wan**

Necmettin Özkan
Melazgîr/Mûş

## Bi dayikekê girtiyên Konyayê re hevpeyvîn:

# 'Emê heqên xwe bistînin'





Li İHD'ya Edeneyê malbatên girtiyan di grevê de ne.

**Bi kurtasî hûn dikarin xwe bi me bidin naskirin?**

– Belê lawo. Navê min Hacî Fatim e. Ez ji Kurdistana Bakur, ji navçeya Berwariyê me ku li ser Sêrtê ye. Ev sê sal in ku em hatine Edeneyê.

**Sedema hatina we ya Edeneyê çi ye?**

– Kurê min, ev 10 sal in te jî dîtiye ku kurd ne ji ber xweşiyê ji welatê xwe derketine. Hatina me jî, ji ber pêkutî û zilm û zora dewletê ye... Ji destpêka têkoşîna rizgariya neteweyî ya Kurdistanê û pê ve qîz û xort di gund de neman. Kesên man jî emrê wan ji 50 û hevraztir bû. Bi kurtayî em bibêjin, xebatkar û sermiyandarên me nemabûn. Dewlet jî bi gav û saetê davête ser gund û ji me re digotin "Zarokên we li ku derê ne? Hûn tev terorîst in. An zarokên xwe ji çiyê bînin xwarê, an jî emê we bi gundê we ve bişewitînin." Û wisa jî kir. Xanî, rez û bostan bi dar û teaman ve şewitandin, heywanan bi saxîtî şewitandin û telef kirin. Qûtê ku di malên me de hebûn (şîş, nîsk, arvan, genim, savar) tevlîhev (têklîhev) kirin, dohn berdan ser wan û şewitandin. Paşî jî rabûn çek dan destên me û gotin bibin cerdevan. Me ev bênamûsî qebûl nekir û em ji welatê xwe qetiyan. Lê belê dilê me li wê derê ye.

**Piştî hatina we di jiyana we de çi guherî?**

– Kurê min! Gotineke pêşiyên me heye; "Neyarê bavan nabe dostê lawan." Ev gotin ji bo me hatiye ziman. Ji ber vê yekê kûçik li her derê kûçik e, li Edeneyê jî me tu xweşî nedît. Şev û roj xew nakeve çavê me. Piştî hatina me, zarokên min têkoşîn nas kirin û îro jî li Girtîgeha Konyayê ne, kurekî min û biraziyeke min hene. Ji ber vê yekê xwînxwar ji mala me kêm nabin. Li gund leşker, li vê derê jî polîs. Qey ev jî qedera me ye lawo.

**Îro hûn hatine vê derê (Komeleya Mafên Mirovan) ji bo girtiyên Konya, Elbîstan û Meletiyê, ji bo piştgiriyê. Hûn dixwazin çi bikin? Armanca we çi ye?**

– Hûn jî zanin ku zarokên me îro (28.3.95) 40 roj in ku di greva birçîbûnê de ne, hinek ji wan jî ketine greva mirinê. Rewşa zarokên me ne xweş e. Dibe ku van rojan şehîdên me jî çêbin. Gelekî jî wan xwîn diavêjin. Çawa ew li wê derê berxwedana xwe dikin, emê jî li vê derê bikin. Nebû emê herin Enqereyê ba serokomar, serokwezîr û wezîrê dadê. Eger zarokên me mafên xwe nestînin, em tiştek safî nekin, emê rast herin Konyayê li ber girtîgehê emê dohn li xwe bikin û xwe bişewitînin.

**Baweriya te bi dewletê heye ku mafên girtiyan bide?**

– Na qet nîn e! Dewlet tu car maf nedaye gelê me yê bindest. Lê belê bi îzna Xwedê, bi berxwedana girtiyên me û bi şervanên me yên serê çiyan, emê mafê xwe bistînin û welatê xwe azad bikin.

** Saetek beriya ku rojnameya me bikeve çapê, me xeber stand ku greva birçîtiyê qediya ye.*

**HEVPEYVÎN:**
**SALIHÊ KEVIRBIRÎ**

## XAÇEPIRSA BIXELAT (18)





Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi usûla qurayê li deh kesan tên belavkirin. Xelata hejmara 20'an; pirtûka **Nûredîn Zaza "Keskesor"** e. Ev pirtûk ji aliyê weşanxaneya NÛDEM'ê ve hatiye çapkirin.
**Jêrenot:**
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsêde binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

**Xelata Xaçepirsê**




"Keskesor"
**Nûredîn Zaza**

## XAÇEPIRSA BIXELAT (20)




PEYVA VEŞARÎ 1 2 3 4 5 6 7 8 9

www.arsivakurdi.org

DIK

## Demagog û berdevka artêşê: Çiller

Rojnameya hefteyî The European a bi mêjûya 24–30'yê adarê li ser rewşa Tirkiyeyê nivîsek weşand. Nivîskarê vê nivîsa şiroveyê Hajîr Têmûryan kurd e û di Times' of Londonê de li ser Rojhilata Navîn nivîsan dinivîsîne.

Di destpêka nivîsê de tê xwestin ku Yekitiya Ewrûpayê pêşniyara Yekitiya Gumrukê li welatekî ku ji aliyê Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî ve hate naletkirin neke.

Şewitandina 1500 gundên kurdan wekî sûcê şer ê herî giran ku piştî Şerê Duyemîn pêkhatî tê binavkirin û wiha tê gotin: "Piştî vê kirina Tirkiyeyê NATO'yê çi kir? 1200 tankên nû dan vî welatî ku van cure kirinên xwe bidomîne."

Nivîskar dide zanîn ku rêjeya enflasyonê li Tirikiyeyê ji sedî 150 ye, lê hilberiya hundirîn ya Tirkiyeyê ji sedî 5 daketiye û meaşa xebatkaran qasî enlasyonê zêde nabûye. Piştre jî ew balê dikişîne ser xurtbûna Partiya Refahê.

Nivîskar gotinê tîne ser bûyera Gaziyê û tewre rojnamegerekî tirk ku piştî bûyerê gotiye, " Min heta niha nizanibûn ew alewî in" Ew dibêje ku rayedarên tirk tevî hebûna 15 milyon kurd, bi milyonan alewiyan û îdiayên demokratîk laîk bûnê, dewleta xwe wekî dewleta tirkên sunî bi nav dike.

Nivîskar Tansu Çillerê wekî demogog û berdevka artêşê dinirxîne. Ew bi hinceta gotinên Tunsu çillerê yên li ser efûya giştî gotine tîne ser kesên ku ji ber bîrûbaweriyên xwe hatine girtin û qala mebûsên kurd bi taybetî jî Leyla Zanayê dike ku ji ber daxuyaniyên xwe hatine sizakirin.

# Artêşa Alman jî şerê qirêjî meşandiye

**Ji ber sedemên siyasî artêşa alman ji tawanên şer dûr hatiye nîşan dayîn, hatiye gotin ku haya generalên alman ji kirinên naziyan tunebûye.**

Di destpêka meha adarê de li Hamburgê pêşangehek vebû, di vê pêşangehê de wêneyên ku tên nîşandayîn bedewiyê nîşan nadin. Li gorî nûçeya rojnameya The European ya 17–23'yê adara 195'an, di vê pêşengehê de rengê şerê ku Artêşa Almanyayê li Yekîtiya Sovyetê û Balkanan meşandiye, tê nîşandan. Ew mijara ku Enstutiya Lêgerînên Civakî ya Hamburgê hildaye dest, 50 sal in li Almanyayê wekî tabûyekê bûye. Ewqas sal in gelê alman hatiye xapandin, rastî ji mirovahiyê hatiye veşartin. Pêşangeha Kataloga Tawanên Şer, yên ku bi destê kumandar û leşkerên Artêşa Almanyayê (Wehrmacht) pêk hatine, li Almanyayê bû sedema genşiyan.

Berpirsiyarê pêşangehê Hannes Heer dibêje ku wan heta niha gelek mesajên tûj standine, gelek kesan ji wan gef xwarine û ew wekî xayîn bi nav kirine. Ji ber sedemên siyasî artêşa alman ji tawanên şer dûr hatiye nîşan dayîn, hatiye gotin ku haya generalên alman ji kirinên naziyan tunebûye. Li gorî Heer Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê jî ji ber "tehdîta Sovyetê" nexwestiye gelê alman ji artêşa xwe sar bibe, loma hovîtiyên şer kirine stûyê SS'an û gelek belgeyên ku sûcên general û leşkerên artêşê nîşan didin ji holê rakirine.



Leşkerên alman di şerê duyemîn de bi hovîtî mirovên sivîl gulebaran kirin.

Niha belge û wêneyên di dest de heyî nîşan didin ku kirinên artêşê jî ne kêmî kirinên naziyan in. Wek mînak ji fermanameyan mirov hîn dibe ku wan ji bo her leşkerekî ku partîzanan li Yugoslavyayê kuştine 100 gundiyên sivîl, ji bo yekî ku birîndar bûye jî 50 gundî kuştine. Generalên alman dîlên Artêşa Sor wekî endamê "îdeolojiyeke çewt" bi nav kirine û wekî dîlên şer nepejirandine. Wêneyên ku di pêşengehê de cih digirin jî eşkere dikin ku leşkerên alman bi taybetî li mirovên cihû û mirtib tadeyên cur bi cur kirine, ew darve kirine, yan jî gule berî serê wan dane, ew kuştine. Li gorî belgeyan kampên ku leşkerên Artêşa Sor lê diman îmkanên jiyanê lê tunebûye. Piraniya leşkerên Yekîtiya Sovyetê di wan kampên ku dîl tim lê birçî bûne û dereceya germê zivistanê 30 dereceyî di bin sifirê re bûye, havînê jî 40 derece bûye, hatine kuştin.

**SAMÎ BERBANG**

## Konferansa Neteweyên Yekbûyî yê li ser guherîna avhewayê

# Felaketên mezin li benda dinyayê ne

Li ser guherîna avhewayê (klîma, iklîm) bi beşdariya nûnerên rêxistinên cur bi cur ji 127 welatan, Neteweyên Yekbûyî civînek li dar xist. Ev civîn di navbera 28'ê adarê û 7'ê avrêlê de li bajarê Berlînê çêbû. Mabesta civînê ji bo pêkanîna biryarên Konferansa Rio de Janerioyê ya sala 1992'yan bingeh avakirin e.

Li gorî biryarên ku hatibûn standin bi pêkanîna hinek bergiriyan, wê rêjeya (nîsbeta) zêdebûna karbondîoksîtê ($CO_2$) di sala 2000'î de daketa tenga (sêra, sewiyeya) rêjeya 1990'î. Lê niha tê gotin ku heta roja îro hikûmatan tu kar nekiriye, ji bo ku bigihîjin vê armancê. Li gorî pîvan û texmînên hinek zanyaran heke bi vî awayî here, heta sala 2000'an wê rêjeya belavbûna $CO_2$'yê bibe % 6.4 û heta 2015'an jî wê bibe % 15. Bi zêdebûna karbondîoksîtê wê germahiya ser rûyê erdê 4.8 dereceyî zêde bibe û ew jî dibe sedema felaketên mezin.

Derûdorên hawirparêz didin zanîn ku dewletên mezin yên ji vê guherîna avhewayê berpirsiyar, xwe nadine ber barê xwe û dixwazin wî barî li welatên xizan bar bikin. Tê gotin ku Amerîka tenê ji sedî 20'ê karbondîoksîtê diafirîne.Karistanên welatên ku pîşesaziya wan bi pêş ketiye nîvê wê gaza ku hevkêşeya sirûştê (tebîetê, xwezayê) xera dike, didin der.

Tevî van welatan, welatên ku neftê dertînin ango endamên OPEC'ê jî, di civînê de xebatên lobiyê dikin ku biryarên tûj neyên girtin.

Biryarên ku ji bo bergiriyê di sala 1992'an de hatibûn girtin ev bûn: 1) Divê hikûmet xebatê bikin ku di dewsa enerjiyên organîk ên wekî neftê de hêza ba, av û rojê bi kar bînin.

2) Di dewsa lêsiwarên xusûsî de, lêsiwarên tomerî bên teşwîqkirin.

3) Avakirina îstasyonên hêza atomî, bêyî azmûnên zanistî ji bo hawirparêziyê, divê qedexe be.

3) Alîkariya kesên li ser pêkanîna enejiyên nû dixebitin, bibe.

4) Divê qirkirina darûbaran bisekine.

**Nûçeyên Derve**

## Li Burundiyê şerê hutu û tutsiyan

Rayedarên Fransayê Roja 28'ê adarê wezîrê xwe yê hevkarî û pêşketinê ji bo navberdîtina hutu û tutsiyên ku heftiya çûyî bi hev ketin, şandin Burundiyê.Piştî ku hutuyan mirovekî tutsî û du kesên belçîkî roja înê kuştin, şervanên tutsiyan êrîş birin ser penaberên hutuyan û gelek jê kuştin, gelek jî ji ber êrîşan reviyan. Tê Tirsîn ku qetlîameke mîna ya Rwandayê çêbe ku sSala çûyî di şerê hutu û tutsiyan bi sedhezaran mirov hatibûn kuştin.

## Rêxistina Efûyê Amerîka tawanbar kir

Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî (REN) bi raporekê bal kişande ser binpêkirina mafên mirovan li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA). Di raporê de tê gotin ku li DYA'yê mirov tên îdamkirin. REN di rapora xwe de qala tade û îşkenceyên ku di bin çav de li mirovan tê kirin jî, dike. Rapor dide zanîn ku li Amerîkayê hê jî dubendî di navbera nijadan de heye û li kesên ku ne amerîkiyên çermspî ne neheqî tê kirin.

## Li Perûyê êrîşa Riya Ronahî

Gerîlayên rêxistina şoreşger ya Perûyê Riya Ronahî hefteya çûyî êrîşek birin ser navçeyeke li bakurê Paytexta Perûyê 3 polîs û leşkerek kuştin. Gerîlayan belgeyên hilbajirtina ku wê 9'ê avrêlê çêbe jî şewitandin. Bi girtina çend serokên vê rêxistinê, ev demeke dirêj bû ku tu livbaziyên wê nedihatin bihîstin. Riya Ronahî rêxistineke maoîst e û ev demeke dirêj e ku li Perûyê şerê çekdarî dimeşîne.

# FAL

**BERAN** (21 Adar - 20 Avrêl)

Derî wê li we vebin, hûnê wekî ku nû ji dayika xwe bûbin kêfxweş û dilşad bin. Êdî cejna we ya azadiyê pîroz be. Tofana giran ev e ku dildara ji we bixeyide û vê cejnê ji we re nehêle.

**GA** (21 Avrêl - 21 Gulan)

Hinek dixwazin xefikan li ber we deynîn. Bi aqilmendî hûn karin xwe jê xelas bikin. Çareya ku hûn ji bo başkirina aboriya xwe difikirin nexerab e, lê dibe pêkanîna wê piçekî dijwar be.

**CÊWÎ** (22 Gulan - 21 Pûşper)

Tiştên ku hişê we tevlihev dikin hene. Di warê ku hûn pê dadikevin de jî loma problem derdikevin. Pişta xwe nedin herkesî, problemên xwe hûn ji herkesî çêtir dizanin û çare di destê we de ye. Dev ji diltenikiya xwe jî berdin.

**KEVJAL** (22 Pûşper - 23 Tîrmeh)

Demeke dirêj e hûn bi niyeteke baş, sozan didin mirovan, feqet hinek tişt ji hukmê we der in. Bêhna xwe teng nekin, başbûna niyeta we, wê riya serkeftinê li ber we veke. Hûnê ji hevalekî xwe xebereke baş bibihîzin.

**ŞÊR** (24 Tîrmeh - 23 Gelawêj)

Di hinek waran de hûn pir serhişk in, ev serhişkiya we dibe ku di rojên pêş de serê we zêhf biêşîne. Kesên ji we serhişktir jî hene û ewê zora bibin. Torbe û tûrikên xwe biavêjin ser milên xwe derkevin nêçîra kewan.

**SIMBIL** (24 Gelawêj - 23 Rezber)

Hûn ji ber tu karî narevin, ji bo wê yekê baweriya xwe bi xwe tînin. Ew jî we hinekî qure dike. Hinek tişt hene mirovan dibin xeletiyê. Ji we re wê diyariyek were, lê buhayê poste wê we bixe tengasiyê.

**MÊZÎN** (24 Rezber - 23 Kewçêr)

Tewrê we yê baş jiyana we pir tekûz dike û dilê hevalan bi we dimîne. Lê belê, mirov çiqas baş be kêmasî naqedin. Kêmasiya we ji nexwendinê tên, bixwînin û bikevine nava civatên ronakbîr.

**DÛPIŞK** (24 Kewçêr - 22 Sermawez)

Hêsirên we wekî çem û robaran bikişe jî, dilê we wekî darûberên payîzê zer bibe jî, bawer nekin ku evîn ji we dûr e. Çûnki riya ku hûn didomînin ne xelet e, hûn li zimanê xwe xwedî derkevin. Zimanxweşî deriyê dilan vedike

**KEVAN** (23 Sermawez - 21 Berfanbar)

Bêhntengiya we ya ku ji ber aboriya nebaş e, wê biqede. Hûnê deynê xwe bidin. Wê ji dereke dûr ji we re tûrek zêr were, bila ew çavên we kor nekin. Pêwist e hûn xwe di warê helbestxwendinê de bigihînin. Huner jî qasî zêr giranbuha ye.

**KARIK** (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)

Zivistan xelas bû, bihar hat, hê jî tiraliya we li ser we ye. Wexta kar e, rabin ji xwe re karekî peyda bikin. Bila bihara we rengîn be ku gûnê we vebe. Tê xuyanê hûn pir di girtîgehê de mane, gûnê we zehf zer bûye, qefaret be.

**DEWLIK** (21 Rêbendan - 11 Reşemî)

Berf dihele, av dikişe, dengê kevok û çivîkan her derê dadigire, kulîlk hêşîn dibin, bayekî hênik pelên daran dihejîne. Ew rewş dilê we geş dike, hûn wekî dengbêjan distrin. Ew rewş pir naçe, hûnê têkevin bin barekî giran, wê piştê ji we bifirîne.

**MASÎ** (20 Reşemî - 20 Adar)

Gelo hûn nizanin. Lê tiştên ku hûn lê digerin ne di behrê de ne û ji we jî pir ne dûr in. Hûn li derdora xwe wekî bêaram tên nasîn, divê hûn vî navî ji ser xwe rakin. Berî hertiştî ramanên we divê wekî avê zelal bin. Hin kes paşgotiniya we dikin.

# Xursî û mêvanê wî

Li navçeya Qoserê (Kızıltepe) bi navê Xursê herêmek heye. Di vî herêmê de 12 gund hene. Ev gund tev di nava geliyekî de ne. Di vê gelî de çemekî pir xweş heye. Li van gundan bi piranî titûn tê çandin. Titûnê Xursê bi nav û deng e. Ji xeynî titûn cur bi cur fêkî jî peyde dibin; zeytûn, hejîr, hinar, mişmiş û hwd.

Gundiyê van gundan pir jêhatî ne. Di ser jêhatîbûna xwe de jî çavvekirî û hebekî jî desteng tên zanîn.

Ji ber pêkutiyên dewletê û ku ji wan tê xwestin bibin cerdevan, çend heb gund tenê mane yên din hatine valakirin û şewitandin.

Li ser jêhatîbûna wan dibêjin: "Karin şeytên bixapînin."

Rojekê mêvanê yekî Xursî tê. Mazûban ji navmaliya xwe re dibêje: "Zû ji me re şîva me hazir biken." Ji lawê xwe re jî dibêje: "Kuro rabe mêvanê me bibe nav dehlê." Lawê wî mêvan dibe li ber darên hejîrê disekinîne. Mêvan hejîran sax diavêje, devê xwe. Piştî ku têr dixwe, îcar wan diqeşêre û dixwe. Mazûban bangî lawê xwe dike (bi erebî dipirse, ji bo ku mêvan fêm neke) dibêje: "Lawo mêvan hejîran diqeşêre an na?" Kurê wî dibêje: "Erê." Piştî vê bersivê dibêje: De ka mêvan bîne em şîvê bixwin. Wî tînin ser sifrê. Mêvan radihêje kevçî ku bixwe lê ka ew mêr ku karibe kevçiyek xwarin têxe devê xwe. Berê nepixiye. Wê gavê hişê mêvan tê serê wî lê tiştek ji destê wî nayê

**MAMOSTE BEDRAN BÊNAV**

# Keroşk

Rojekê keroşkê ji xwe re got: "Gelo çima ez wiha bêzirav û tirsonek im? Dema ez mişkekî jî dibînim, ji tirsan ez navqetî dibim. Nabe, divê ez herim xwe biavêjim avekê û xwe bixeniqînim."

Keroşkê rabû, berê xwe da ber çem. Nêzîkî çem dibe û di ber keviya wê de dimeşe. Herçî req û beqên ku çav pê diketin, xwe diavêtin nava avê. Keroşkê dema dît ku req û beq ji berê direvin û ditirsin, di ber xwe de bişirî û got:

– Wele ez êdî xwe navêjim avê û xwe naxeniqînim. Wa ye ji min bêziravtir û tirsonektir jî hene.




Keroşka bizdonek û tirsonek bi xêra beq û reqan bizar bû. Vegeriya mala xwe. Jiyana xwe dom kir. De vêca hin mirovên me hene, dema çav bi tanq, top û leşkerên tirkan dikevin, ji tirsan dikin bimirin. Ji ber ku bêbawer in, dikevin vî halî. Em bizanibin ku yên ji me jî ditirsin hene.

**XELÎL GULER**

# Ga erê xwariye

Li gundekî Kurdistanê mirovek hebû, pir ji dewarên xwe hez dikir. Ji bo wê yekê jî her şev jina xwe û qîza xwe tembîh dikir ku dewaran bêxwarin nehêlin. Şevekê kete bîra wî û got: "Gelo gayê wan êm kirine an na (xwarin danê an na)." Ji jina xwe pirsî got: "Gelo we êm daye gayê zerî?" Jina wî got: "Erê." Demeke din dîsa meraq kir, ji bûka xwe re got: "We ga êm kiriye?" Buka wî got: "Erê." Demeke din jî derbas bû xwarina ga ji bîrê neçû. Bangî qîza xwe kir, got: "Qîza min we êmê ga dayê an na?" Qîza wî got: "Erê." Demeke din jî qîza xwe ya biçûk re got, qîza wî ya biçûk jî got: "Erê." Bê xeyalan raket.

Serê sibê zû debara wî nehat ji xew rabû û çû axûr. Nihêrî, çi bibîne, gayê zerî ji birçîbûna miriye. Kir hawar û gazî, gundî li ser serê wî civiyan. Hinekan jê pirsîn: "Gelo çi bûye?" Gundî got: "Gayê min miriye." Gundiyan got: "Gelo çi xwariye ku miriye?" Xwediyê ga got: "Gayê min 'Erê' xwariye, ji bo wê yekê miriye."

**ÇIYA MAZÎ**

## Ma ew kêr qedexe nîn e?

Rojekê gerîla diçin gundekî. Li menzelekê (ode) gundî dicivin. Şervan tevî çek û bombeyên xwe rûniştine. Wê ji gundiyan re bipeyivin. Di destê şervanekî de kêrikeke biçûk heye.

Şervan bi vê kêrikê dileyize. Gundiyekî bitemen (pîr) ku di destê şervan de vê kêrikê dibîne, bi lez xwe davêje pêş û dibêje: "Ma ev kêr ne qedexe ye heval? Lê ku dijmin bi te re bigire..."

## Ne girîng e

Rojekê li Lubnanê li wargehên rêxistinên şoreşger, gerîla perwerde dibin (tên hêvotin). Yek ji wan gerîlayan li ser bombeyekî pir tund dixebite. Dixwaze ku saetekî pê ve girê bide. Gerîlayekî ku vê xebatê dibîne, bi lez: "Heval qewet be. Karê ku tu dikî pir girîng e. Bala xwe baş bidê, serwext be." Gerîlayê ku bombeyê amade dike, dibêje: "Heval ne girîng e. Tiştek nabe. Ew biteqe jî, bombeyên me yê wekî wê gelek in..."

**(Ji bo bîranîna hevalê Xebat)**

www.arsivakurdi.org



**Beriya 23 salan jî artêşa tirk 11 şoreşger qetil kiribûn**

# KIZILDERE '72

Serok û endamên Eniya /Partiya Rizgariya Gelên Tirkiyeyê (THKP/C) li bajarê Tokatê ji aliyê hêzên dewletê ve di 30'yê adara 1972'yan de hatin kuştin.

Di sala 1972'yan de li Tirkiyeyê xwedevanên zaníngehan li dijî dewletê tekoşîneke giring kirin. Di nava vê tekoşînê de 3–4 rêxistinên veşartî ava kirin ji van û yên herî navdar THKO û THKP/C bûn. Serokê THKP/C'yê Mahir Çayan piştî ku ji Girtîgeha Maltepeyê reviya tevî çend hevalên xwe çû Tokatê û haziriya şerê çekdarî kir.

Piştî girtina Deniz Gezmiş û hevalên wî ji bo rê li ber dardekirina wan bê girtin, Mahîr û hevalên xwe 3 teknîsyenê Îngilîz revandin. Li Kızıldereya ku li ser Niksarê ye, Mahir û hevalên wî Cîhan Alptekin, Ömer Ayna, Saffet Alp, Ertan Saruhan, Ahmet Atasoy, Nihat Yılmaz, Hüdai Arıkan, Sinan kazım Özüdoğru, Sabahattin Kurt û 3 teknîsyenê Îngiliz ji aliyê hêzên dewletê ve hatin kuştin. Tenê Ertuğrul Kürkçü bi saxî hate girtin.

**Tiştek heye ku li Tirkiyeyê qet xelas nabe**

# İŞKENCE



Komîsyona Mafên Mirovan a Ewrûpayê, li herêma taybet (li bakurê Kurdistanê) ji beku dema di binçav de girtinê 30 roj in, Tirkiye mahkûm kir. Li Hezexa Şirnexê 3 kesî serî li komîsyonê xistibûn û komîsyonê jî serlêdana wan li cih dîtibû.

Komîsyona Mafên Mirovan a Ewrûpayê, serlêdana serokê SHP'ê ya Hezexê Hüseyin Demir, Muxtarê Taxa Yenî Mahalle Şükrü Suşin û muxabîrê rojnameya Hürriyetê Faik Kaplan bi encam kir û dewlet ji bo ku ew kes 30 roj di binçav de mane mahkûm kir. Komîsyon piştî vê qerarê, ji bo çareseriya dostî li aliyan bang kir. Ebûqatê Demir, Suşin û Kaplan; Hasip Kaplan daxuyand ku, hikûmet wextê binçavkirinê wekî yê Ewrûpayê kin û maqûl bike û di tezmînatê de jî li hev bikin, wê muracatî li Diwana Mafên Mirovan a Ewrûpayê nekin. Ku ev yek dewlet neyîne cih wê li dîwanê muracat bikin.

**Navenda Nûçeyan**

# 'Tiliya MİT'ê di cînayetên Ewrûpayê de heye'

Ev 3–4 sal in ku li Ewrûpa û hin deverên din kesên nêzîkî tevgera azadiya Kurdistanê bi sûîkast û êrîşên çekdarî tên kuştin û birîndarkirin. Li ser van sûîkast û êrîşan gelek tişt hatin gotin û nivîsandin. Komara tirk eleqeya xwe û van kirinan qebûl nekir. Lê rayedarên dewletê di daxuyaniyên ku didin çapemeniyê de eleqeya dewletê û van sûîkastan dane der. Serokê Lijneya Leşkerî yê berê Doğan Güreş, di daxuyaniyeke xwe de gotibû," Me 160 ajanê MİT'ê ji bo kurdan û alikarên wan ji holê hildin şande Ewrûpayê." Mebûsê Partiya Karker a Îngilistanê û Parlementerê Parlementoya Ewrûpayê, Alf Lomas piştî vê daxuyaniya Güreş, muracatî Parlementoya Ewrûpayê kir û ji parlementoyê zelal kirina vê mijarê xwest. Alf Lomas, 16'ê reşemiya 1995'an ji Parlementoya Ewrûpayê, Weziriya Karê Derve yê Îngilistanê û Serok Wezîrê komara tirk Tansu Çillerê re name şandin. Di nameyan de tê gotin ku,cînayetên li Ewrûpa yê bi pirsgirêka kurdan re eleqedar, MİT'ê ew organîze kirine."Lomas ji xeynî van cînayetan, eleqeya MİT'ê û van sûîkast û êrîşên li jêr jî dibîne."Di 20'ê adara 1994'an li Lefkoşeyê kuştina Serokê Komîteya Piştgiriya Kurdistanê, Theofilis Georgiades. Di 7'ê reşemiya 1994'an kuştina Koordînatorê Komîteya Kurdistanê ya Danîmarkayê, İmdat Yılmaz. Di 29'ê berfanbara 1994'an birîndarkirina Serokê Halkeviya(Mala Gel) Londonê, Nafiz Bostancı.

Lomas, ji Serok Wezîr Çillerê daxwaza sekinandina van cînayetan dike û ji Parlementoya Ewrûpa jî li ser vê mijarê likolînekê dixwaze.

**Navenda Nûçeyan**

**ERNK, YNK, PSK û PDK– I bi hev re daxuyayaniyek dan:**

# İşgala başûr kurdan nêzîkî hev dike

Piştî operasyona artêşa tirk ya li başûrê Kurdistanê ERNK, YNK, PSK, û PDK–Î yê li Viyanayê roja 25'ê adarê tevî hev daxuyaniyek dane çapemeniyê û ji Serok Komar, Serok Wezîr û hwd. re name şandin.

Di daxuyaniya çapemeniyê dehate gotin ku, "Komara tirk ji sala 1991'ê û bi vir de operasyona xwe ya herî mezin dike. Û di vê operasyonê de heta neha 11 sivîl ji aliyê leşkerên tirk ve hatine kuştin. Vê operasyonê dîsa nîşan da ku kî çareseriyê naxweze û xwînê dirijîne. Tirkiye ji tewra Ewrûpa û Amerîkayê cesaretê distîne û van operasyonan dike. Komara tirk bi van kirinên xwe hemû peyman û qerarên navneteweyê diperçiqîne." Di daxuyaniyê de li hemû dewlet û saziyan bang tê kirin û ji wan tê xwestin ku, îşgala başûrê protesto bikin û ji bo pirsgirêka kurdan û Kurdistanê bi aştiyê were çareserkirin, alîkariyê bidin rêxistinên kurdan.

Di nameya ku ji Serok Komar, Serok Wezîr û rayedarên din re hatiye şandin de tê xwestin ku, ji bo vekeşîna artêşa tirk ji Kurdistana Başûr parlemento û hiqûmeta Avusturyayê gavên siyasi biavêjin. Li binê nameyê imzeya nûnerê ERNK'ê, YNK'ê, PSK'ê û PDK–Î heye.

**Kurd–A**

**Protestoya li hemberî dagirkeriya artêşa tirk berdewam dike**

# Meşên li Ewrûpa



Roja 25.03.1995'an li bajare Berlînê bi beşdariya nêzîkî 1000 Kurdistaniyên welatparêz û li hemberî dagîrkariya dewleta tirk ya li ser başurê Kurdistanê, rêpêwan (meş) ek hate çêkirin. Di vê rêpêwanê de du qasî beşdaran polîsên alman hatibûn, ku ji aliyê welatparêzan ve ala ERNK'ê hate nîşandan bi piranî dest bi êrîşê kirin û beşdar êşandin û zêdeyi 7 kesan jî xistin bin çav. Di dema vê bûyerê de nivîskarekî mezin ê ereb (ku nexwest navê wî binivîsin) wisa got: "Heya niha min tenê bihîstibû ku polîsên alman kurdan diêşînin, lê min tu caran bawer nedikir ku ewqas bi destê polîsên alman mafên mirovan bên binpêkirin.

Di gel tevî van tiştan jî meş bi dirûşmên şoreşgerî û neteweyî yên wekî:" Bijî Kurdistan, Şehîd namirin, Kurdistan goristana dijminan e, Bijî PKK û Bijî Serok APO ku ji aliyê welatparêzan ve dihatin gotin, heya dawiyê berdewam kir.

**Welatê Me/Berlin**

**YNK'ê operasyona li ser Başûr protesto kir:**

# Artêşa tirk zarokan dikuje

**"Pêşmergeyên PDK–Iraq, bi leşkerên tirk re di operasyonê de ne. Ew, kincên leşkeran li xwe dikin û sîleh, mal û hebûna gundiyan talan dikin. Di vê dagirkirinê de destê PDK–Iraq jî heye..."**

YNK (Yekîtiya Niştimanî Kurdistanê) Buroya Şamê ya Têkiliyên bi Derve re, roja 25'ê adarê daxuyaniyek bi faksê ji hemû sazî û rêxistinên neteweyî û navneteweyî re şand.

YNK diyar dike ku kampên PKK li ew cihên ku operasyon lê çêdibe tune ne. Di daxuyaniya YNK'ê de, tê gotin ku pêşmergeyên PDK'ê kincên leşkerên tirk li xwe dikin û bi wan re di operasyonê de cih digirin. Daxuyanî wiha dewam dike: "Pêşmergeyên PDK–Iraq, bi leşkerên tirk re di operasyonê de ne. Ew, kincên leşkeran li xwe dikin û sîleh, mal û hebûna gundiyan talan dikin. Di vê dagirkirinê de destê PDK–Iraq jî heye..."

Di vê operasyonê de li gorî daxuyaniya YNK'ê, "... ji zarok, gundî û jinan bêhtir kesek nehatiye kuştin, gund hatine rûxandin, şewitandin."

YNK li ser vê rewşê wiha dibêje: "Ev hovîtiya leşkerên tirk tu carî nayê qebûlkirin. Divê bêqeyd û şert operasyon were rawestandin û leşker ji herêmê vekişin..."

YNK, ji raya giştî, saziyên navneteweyî, ji hemû mirovahiyê û bi taybetî saziyên humanîstî daxwaz kir ku lerin bi çavên xwe qirkirina kurdan bi destê leşkerên tirk li başûrê Kurdistanê bibînin. Hate gotin ku kesên têne kuştin ne gerîla ne, sivîl in, çekên ku dewleta tirk nîşan dide jî, ne çekên PKK'ê ne, ew çekên gundiyan in. Daxuyanî dibêje: "Werin vê qetlîamê bibînin..."

www.arsivakurdi.org

## Bi Endamê Komeleya Danasîna Çanda Hacı Bektaş–ı Veli, Hıdır Doğan re

# 'DIVÊ ZIHNIYETA DEWLETÊ

**Doğan: "Rê vedikin ku komeleyên faşîst li Gaziyê vebin. Lê gelê taxê tu caran bi dilgermî li sê heyvikê û gur nanihêre. Ji ber ku dizane li Mereşê, li Sêwazê, li Çorumê, li Meletiyê yên ku qetlîam kirin ev bûn."**

**Hûn dikarin behsa rewşa Gaziyê ya beriya bûyerên dawî, ji me re bikin. Herhal ev bûyer ji ber xwe ve neqewimîn?**

–Li Taxa Gaziyê nifûsa kurdên alewî zêde ye. Ew ji aliyê siyasî ve jî çepgir in. Ev rewş jî li hesabên hin derdoran nayê, derdorên ku dixwazin Tirkiyeyê paşverû bikin, ber bi bîr û baweriyên rastgir ve bibin. Lewma dixwazin Taxa Gaziyê ya Gaziosmanpaşayê bixin destê xwe. Êrîşî ser esnafan dikin, mirovên ku diçine karên xwe têne girtin û pêkutiyên bi vî awayî li mirovên xwedî raman û fikrên çepgir dikin, wan diqutifînin.

Rê vedikin ku komeleyên faşîst li taxê bi cih bikin. Lê gelê taxê tu caran bi dilgermî li sê heyvikê (hîlal) û li gur nanihêre. Ji ber ku dizane li Mereşê, li Sêwazê, li Çorumê, li Meletiyê yên ku qetlîam kirin ev bûn.

### Mirov jî êdî amade bûn

**Dihate hêvîkirin ku wê gel ewqas bertekiyê (reaksiyon) bide nîşan? Di gel helwesta (tewra ) medyayê û dewletê ku çewt–agahî didane gel.**

– Li ba dewletê Gazî bi awayeke potansiyel devereke "sûcdar"e. Dibe ku bertekiyeke ew qas mezin hêvî nedikirin û nedipan, heta dikare bê gotin ku hesabê muhalefeteke wisa mezin nekiribûn. Lê sînorê her tiştî û tirûşa (berxwedaniya) wî/wê heye. Êdî tehemûla însanê vir nemabû, digot: "Heta ez her roj bi tirsa mirinê,girtine, îşkencekirinê bijîm, bimirim ji vê rewşê çêtir e."

Gel ji neheqî, tehde û pêkutiyan tije bûbûn. Ev qewimînên dawî bû sebebê ku gel a di hundirê xwe de birêje .

Tu dê ji seriyêkê Gaziyê ve bikeviyê, qehwexaneyan gulebaran bikî, mirovan bikujî. Na, êdî tehemûla mirovan nemaye.

### Êrîşeke faşîst a eşkere hebû

**Em dikarin bibêjin ku gelên li Gaziyê tesîr ji serhildanên li Kurdistanê standibûn û ji aliyê din ve, ji ber çi bi awayekî girseyî bi ser Qereqola Polîsan a Gaziyê ve çûn, lê ne bi cihekî din ve?**

–Em ji vê rewşê vê encamê derdixin. Rik û kîna gel li dewletê bû. Li vir nûnerê (temsîlvanê) dewletê, saziya we çi ye? Qereqol e. Lewre dibêje "Ê ku ev yek bi min kir dewlet e."

Di nava gel de kesên ku rewş dişibandin întîfadeya Filistînê jî hebûn. Mirov dikare bişibînê. Mirov jî amade bûn.

**Di bûyerê de ji bilî mirovên ji bîr û baweriya alewîtiyê kesên sunî jî birîndar bûne. Lê hewlên ku bûyerê wekî encama ne linevkirina alewî û suniyan bidin zanîn jî hene. Li ser vê rewşê çi gotinên we hene?**

– Di rastiyê de xwestin ku lihevxistinekê di navbera alewî û sûniyan de derxin. Lê ji ber helwesta kesên biwîjdan negihiştin miradên xwe. Mesela, yek derdiket digot: "Binihêrin bang (ezan) tê dayîn. Neyarên me ew in, haydê em bigirin ser mizgeftê (camiyê ). Ziyanê bidinê." Em nizanin ew kî bûn, lê dixwestin ku di navbera alewî û suniyan de lihevxistinekê derxin.

Lê bi rastî gelşa (problema) mirovan a mezhebî nîn bû. Ez difikirim ku aliyekî bûyerê ya siyasî heye. Binêrin gelek bîrîndar ên ku ji bîr û baweriyên sunîtiyê jî tên, hene. Ev jî nîşan dide ku biratiya alewî û sunîtiyan, qismî be jî, hatiye çêkirin. Her çiqas xwestin neyartî û şer di nava alewî û suniyan de derxin, mirovan dît ku êrîşeke faşîst a eşkere heye.

### Medya li gorî talîmatan liviya

**Hûn helwesta medyayê di qewimînên Taxa Gaziyê de çawa dinirxînin?**

–Di serî de hemû kanalên televizyonan û rojnameyan bûyer wekî êrîşeke li dijî alewiyan ragihandin temaşevan û xwendevanên xwe. Erê, êrîşî qehweyên ku "alewî" lê rûdiniştin kirin, lê bihatina bûyerê di cih de vekolandina, wê bi dîtina ku aliyekî din ê qewimînê heye.

Mîna her carê çapmenî, medya bi fermanê (emîr) tevgeriya. Li gorî prensibên medyayê nelibitîn û objektîv nebûn. Em di vê baweriyê de ne ku medya li gorî talîmatan weşana xwe domand.

**Li gorî daxuyaniyên raydarên dewletê wekî Waliyê Stenbolê Hayrî Kozakçıoğlu û Mudurê Emniyeta Stenbolê Necdet Menzîr, di nava polîsan de kesên ku li derveyî fermanan liviyane hebûne. Hûn van beyanatan çawa dibînin?**

–Ez nikarim der heqê xebitîna pergala dewletê de tiştinan bibêjim. Ez bi vê yekê bawer im, heke dewlet bixwaze dikare vê gelşê hel bike. Bûyerê bi me da zanîn ku hêzên tarî û veşarî hene.



Endamê Komeleya Danasîna Çanda Hacı Bektaş–ı Veli, Hıdır Doğan

## Gaziosmanpaşa û bîlançoya bûyera 12'ê adarê

Li Stenbolê li Taxa Gaziyê di salvegera derbeya leşkerî ya 12'ê adara 1971'î de 4 qehwexane û pastexaneyek hatin gulebarankirin. Di encama vê yekê de kesek miribû û gelek jî birîndar bûbûn. Şoferê teqsiya ku di bûyerê de hatibû bikaranîn jî, hatibû şerjêkirin.

Medya jî bûyer, wekî êrîşeke li hemberî alewiyan da bihîstin. Gelên li taxê ji bûyerê polîs û faşîst berpirsiyar ditin. Ji lew re, berê jî bûyerên bi vî rengî qewimîbûn û "hêzên sivîl" girseya gel gulebaran kiribûn. Mirovek, ji mirinê filitîbû.

Dema li demografiyaya Gaziyê bê nihêrtin, tê dîtin ku şêniyên wê %80 zêdetir kurd in û pêşverû ne. Ji aliyê mezhebî ve jî bi piranî kurdên alewî yên ji Sêwazê, Dêrsimê, Gumguma (Vartoya) Mûşê, Meletiyê û hwd. in. Lewre tax bi navê "taxa kurdan" jî tê navandin. Taxê di hilbijartinên dawî de jî %60'î pirtir ray dane hêzên çepgir.

Gelê Gaziyê li hemberî bûyerê bêdeng nema û "serhildanek" li dar xist. Encama bûyerê 17 mirî, 31 winda, zêdeyî 350 birîndar, li derdora 100 kesî binçavî û 8 kesên girtî. Ev hejmar me ji Komeleya Danasîna Çanda Hacı Bektaş–ı Veli ya Gaziyê standin.Ev yek jî gotin ku polîs digire ser malan û mirovan dixe binçav.

Hate ragihandin ku di qewimînan de 140 dikan û 13 erebe hatine xesirandin.

Divê ev jî bê gotin, tenê li Gaziyê rûdan (hedîse) neqewimîn. Li Umraniyeya Stenbolê (6 kes mirin), Enqereyê, Bursayê, Edenê, Mersînê, Manîsayê gel bertekiya (reaksiyona) xwe da nîşan û di van bûyeran de jî birîndarî çêbûn. Rayedarên komeleyê daxuyandin ku li seranserî Tirkiyeyê ji 1000 kesî zêdetir birîndar hene.

Li dewletên Ewrûpayê jî ev bûyer hatin protestokirin; mîna Almanya, Yewnanîstan û Îngiltere. Di bûyeran û kuştinan de helwesta polîs û hikûmetê hate rexnekirin û berpirsiyar hatin dîtin.

...yvîn:

# ...IGUHERE'

Jixwe birêz Kozakçıoğlu di daxuyaniya xwe de ya ku dabû rojnameya Milliyetê, dibêje ku di nava saziyên dewletê de kesên bi gotina wan nakin, hene.

Lê ev heye, heke bê xwestin mesele hel dibe. Çunkî heta ku derê ew dikarin xwe vêşerin. Ji bo nimûne; kesek ji panzerê an jî, ji kêleka wê sîleh berî cemxaneyê dide. Însan tên kuştin, kî ye ev kes? Panzer jî ku hat, çi çax ji garajê derket, ê ku diajot kî ye? Dema li serê bê sekinîn, em bawer dikin ku wê kiryar (fail) derkeve holê.

**Divê gelş li ser hîmê biratiya çareser bibin**

**Tê gotin ku wê cihê polîsên rayedar ên ji devera bûyerê bê guhertin, an jî wezîfeya wan bê guhertin. Bi ya we ev bes e?**

– Na na. Tavilê bi riya medyayê dan diyarkirin ku "hêzên ewletiyê" yên vira hatine guhertin û yên nû û pak şiyandine cihên yên kevin. Bi ya min gelş ne ev e. Gelş guherîna zîhniyetê ye. Nêrîna wan a li mirovan guheriye, wê mirov karibin bi hesanî bîr û baweriyên xwe der bibin (îfade bikin)? Na, ez wisa nahizirim.

**Hûn ji guherîna zîhniyeta teşkîlata hêzên ewletiyê (polîsan) an jî, ji ya dewletê behs dikin?**

– Na, divê zîhniyeta dewletê biguhere. Divê nêrîna wê ya der barê gelş û gelemşeyên li welêt biguhere. Îro li aliyekî welêt xwîn tê rijandin, li aliyekî mirov bêdarizandin (bêmehkemekirin) tên kuştin, li aliyekî îşkence li mirovan tê kirin. Pir ecêb e. Wezîrê ji Mafên Mirovan Berpirsiyar (yê berê) Azimet Köylüoğli radibe, dibêje ku li Tirkiyeyê 29 celebên îşkenceyê hene. Serokwezîr Tansu Çiller jî radibe dibêje ku wê îşkencekirinê ji holê rake.

Na bi vî terhî gelş çareser nabin. Divê çareyên hîmî bêne dîtin. Ji dela neyartiya gelan, divê bi mentiqa bîratiya gelan gelş bêne çareserkirin. Ne bi bîratiya "heram" bi ya "helal" divê mesele bêne helkirin.

**Li Almanyayê bûyerek qewimîbû, hatibû îspatkirin ku polîs endamekî partiyeke îllegal bêdarizandin kuştiye. Li ser vê yekê Wezîrê Karê Hundirîn ê wê demê ji wezîfeya xwe îstîfa kir. Di bûyêren Gaziyê de 17 mirov hatin kuştin û Wezirê Karê Hundirîn Nahit Menteşe da zanîn ku xwe ji qewimînê berpirsiyar (mesûl) nabîne. Li ser van herdu mînakan hûn dikarin çi vebêjin?**

– Mînakeke baş e. Li vir wezîr ji karê xwe destê xwe dikişîne. Lê, li Tirkiyeyê her tişt formalîte ye. Van bûyerên dawî careke din derxistiye rastê ku parlamento çiqas bi gelşên gel re têkildar e, çiqas nûnerîtiya gel dike, çiqas xwedî karîn û hêz e, çiqas xwediyê berpirsiyariyê ye.

**Li Tirkiyeyê her tişt formalîte ye**

**Midurê Emniyeta Stenbolê Necdet Menzir, bi civîneke çapemeniyê diyar kir ku, di bûyerê de polîs li gorî qanûnan, wezîfeya xwe anîne cih û sûcekî wan nîn e. Divê ku qanûn bêne guhertin. Ji aliyê din ve jî daxuyandibûn ji nava polîsan kesên ku li derveyî talîmatên wan liviyane hebûne. Hûn ve nakokiyê çawa îzah dikin?**

– Rewş pir eşkere ye. Tablo ev e; yan dibêje li min guhdarî nakin, ez qirdik im, an jî dibêje haya min jê heye. Tiştekî ku bê muneqeşekirin nîn e, her tişt li ber çavan e, rewş pir û pir diyar e. Li welatekî ku dibêjin lê demokrasî heye, munaqeşekirina îzahên bi vî rengî ne mumkun e.

**Tê gotin ku wê alîkariyeke maddî li şêniyên Gaziyê bê kirin. Ên ku di qewimînê de ziyan dîtine. Ev ne teselîkirina alewiyan e?**

– Li welatê me, nêzîkî deh salan e ku şerek didome. Di vî şerî de dewlet gelek şihitiye û xesiriye. Ji aliyê siyasî û aborî ve ketiye tengasiyekê.

Li vî welatî her tim alewî wekî notirvanên laîsîzmê hatine dîtin, wekî ambara rayan hatine dîtin. Bi vî çavî li wan hatiye nihêrtin. Sebebê di demên dawî de avakirina komeleyên alewiyan, derxistina kovar û weşanên wan, kitêbên li ser wan ev e: Dewlet ditirse ku wan ji destê xwe bifilitîne. Dibêje, heke alewî pişt bidine şerê ku li hemberî dewletê tê kirin, wê rewş pir xerab bibe. Lewma ketiye dû ku hin mafan bide alewiyan. Dixwaze ku alewî dev ji adetên xwe yên muhalîf berdin, li hemberî dewletê serî ranekin û bibine "zarokên baş", "mirovên baş" û hwd.

Ew alîkariya ku jê behs tê kirin jî, ne ji dil e. Heke dewlet ji dil be, bila çareyên hîmî (esasî) ji meseleyê re bibîne. Bi ya min ev hesabên dewletê yên xwexelasiyê ne.


**Der barê helwesta partiyên siyasî yên li ser qewimînên dawî de hûn dikarin çi bibêjin?**

– Hin serokên partiyên siyasî daxuyaniyên wisa dikin, bi rastî kenê kûçikan jî bi wan tê. Hatin, neketin Gaziyê, kîn û rika gel dîtin. Helwesta xwe ya der barê bûyerên berê dewam kirin. Xwestin serê qewimînan binixumînin.

**Niha morala we çawan e?**

– Baş e. Bi rastî jî baş e. Lewre em bawer in ku em mafdar in. Bi gotineke din me sûc nekiriye. Tu aliyekî me yî sûcdar nîn e. Bi heqdariya xwe em dibêjin ku em baş in û morala me li cih e.

**HEVPEYVÎN:**
**ZANA FARQÎNÎ**
**EZNAS MAYA**



**Di bûyera 12'ê adarê de dîmenek ji Gaziosmanpaşayê.**

www.arsivakurdi.org

## Îşgal li her derê tê protestokirin

Piştî îşgala başûrê Kurdistanê li Ewrûpayê û li hin deverên din Kurdistaniyan dest bi protestoyan kirin.

Tê zanîn ku başûrê Kurdistanê di bin parastina Neteweyên Yekbûyî (N.Y) de ye. Lê, ev herêm hate îşgalkirin û li wir sivîl tên kuştin û NY bêdeng dimîne. Ji ber van yekan jî 300 Kurdistanî avahiya NY'ê îşgal kirin û xwestin ku bi rayedaran re biaxivin. Polîsan mudehaleyî Kurdistaniyan kir. Lê kurdistanî ketin avahiyê û di avahiyê de sloganên wekî,"Bijî Serok Apo, NY karê xwe bike, Komara tirk ji Kurdistanê biqeşite" avêtin. Piştî ku bi Cîgirê Serokê Mafên Mirovan yê Neteweyên Yekbûyî re axivîn ji avahiyê derketin. Çapemeniyê eleqeyeke mezin nîşanî protestovanan da.

Li paytexta Amerîkayê, 300 mirovên Kurdistanî li ber Qesra Spî îşgala Başûr protesto kirin.

400 Kurdistanî li bajarê Fransayê Belfortê îşgala başûrê Kurdistanê protesto kirin û meşiyan. Meşê bi coşiyeke mezin ji îstasyonê heta wîlayetê dom kir. Di meşê de sloganên wekî, "Bijî Serok Apo, Wê Kurdistan ji faşizmê re bibe goristan, Bijî PKK" hatin avêtin.

Li Osloya Norwecê, 300 mirovên kurd îşgala Başûr bi meş û sloganan protesto kirin. Di meşê de, meşvan bi alên ERNK'ê û bi sloganên wekî"Bijî Serok Apo, Bijî PKK û hwd." meşiyan.

**Navenda nûçeyan**



Leşkerên tirk ên îşgalker, ji aliyê şeklî ve ji xwe dişibînin leşkerên amerîkî yên ku di şerê li hemberî Vîetnamê de ji hev pelişîn.

Li gorî daxuyaniya ARGK'ê, di deh rojan de ji leşkerên ku başûr îşgal kirin 516 heb mirin.

# BAŞÛR DIBE XEFIKA LEŞKERAN

Ev hefte şer li her deverê Kurdistanê belav bû. Lê, şerê dijwar bi giranî li başûrê Kurdistanê qewimîn. Li başûrê Kurdistanê, artêşa tirk bi tank, top û belafiran êrîşî gerîlayên ARGK'ê kir. Gerîlayên ARGK'ê jî Başûr belav bûn û bi cerd, kemîn û hwd. bersiva artêşa tirk da.

**23. 3. 1995**

Di navbera Haftanîn û Çiyayê Reş de, di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de şer derket. Di vî şerî de 37 leşker, 4 subay, 2 yüzbaşî û 3 çavîşên daîmî mirin, nêzîkî 50 leşker jî birîndar bûn.

Li gorî agahiya Berdevkê Partiya Komunîst a Îranê, cendekê 63 leşkerên komara tirk bi balefiran birine Êlihê. Li gorî eynî çavkaniyê 3 zarok jî di nav de, 11 kes bi bombebarandina balefirên komara tirk hatine kuştin. Di vî şerî de 13 jî gerîla mirin.

Li nêzîkî navçeya Celê di navbera leşkeran de şer derket, di vî şerî de 8 leşker mirin û 13 jî birîndar bûn.

Nêzîkî 50 firoke tim birîndaran dikşînin nexweşxaneyên Geverê, Wanê û Çolemêrgê. Li Erzînganê gerîlayên ARGK'ê hêzên dewletê xistin kemîna xwe, di vî kemînê de 2 leşker mirin, 1 jî birîndar bû.

Di warê Şendoranê de gerîlayên ARGK'ê êrîş kirin ser hêzên dewetê û 37 leşker kuştin, şer hêj jî didome.

Li warê Basyayê gerîlayên ARGK'ê hêzên dewletê xistine kemîa xwe. Di kemînê de hêzên dewletê bi hejmarekê giran zerar dîtine, nêzîkî 20 leşkeran xwe avêtin çemê Basyayê û xeniqîn.

**24. 3. 1995**

Li warê Metînan di navbera gerîlayan û hêzên dewletê de şer derket. Di vî şerî de nêzîkî 80 leşker mirin û 2 panzer jî îmha bûn.

Li gundê Xapuşkê, gundiyek ji aliyê hêzên dewletê ve hate kuştin, gundiyan jî êrîş dan ser hêzên dewletê û 20 leşker dîl girtin, leşker hêj jî winda ne.

**25.3. 1995**

Ew malên ku ji Kurdistana Bakur koçber bûn û çûn li Kurdistana Başur, ji wan malan 700 mal ji aliyê dewletê ve hatine girtin û aqîbeta wan ne kifş e.

Di roja 5'emîn ya cenga Başûr de birek leşkerên tirkan xwe ji zinarekî wer kirin û 54 leşker mirin.

Di navbera Qamîşiyê û Amediyeyê de gerîlayê ARGK'ê hêzên dewletê xistin kemîna xwe û 17 leşker mirin, gerîlayan 2 cemseyên leşkeran jî rûxandin.

**26. 3. 1995**

Li Xakurkê di navbera gerîlayê ARGK'ê û hêzên dewletê de şer derket. Di vî şerî de 4 leşker mirin û 3 leşker jî birîndar bûn.

Li warê Kendorayê di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de şer derket, di vî şerî de 15 leşker mirin û hejmareke zehf jî birîndar çêbûn.

Gerîlayên ARGK'ê êrîş dan ser qerargeheke dewletê ya seyar û 50 leşker kuştin. Di vî şerî de 17 gerîla mirin, 10 jî birîndar bûn.

Di navbera Orkeyê û Banyeyê de balefirkê hêzên dewletê gelê sivîl bombe kirin, zarokeke qîzik mir, 6 mirov jî birîdar bûn.

Di navbera Xirorê û Metînan de, di navbera gerîlayê ARGK'ê û hêzên dewletê de şer derket, di vî şerî de 127 leşker û gerîlayek mirin.

**27.3.1995**

Gerîlayên ARGK'ê li Haftanînê êrîş dan ser hêzên dewletê, di şer de 32 leşker û 2 gerîla mirin.

Gerîlayên ARGK'ê di newalekê de 4 laşên leşkeran û laşê gerîlayekî dîtin.

Li gorî mûxabîrê KURD–A'yê Ahmet Yiğit 28 laşên leşkeran jî di newaleke din de hatine dîtin

Li ser riya di navbera Dih (Eruh) û Şirnexê de gerîlayên ARGK'ê hêzên dewletê xistin kemîna xwe, şerê di navbera wan de 3 seatan dom kir û bi qasî 140 leşker mirin.

Hêzên dewletê li ela qurmiyê pêl mayîna gerîla kirin û 8 leşker mirin, 11 jî birînar bûn.

**28.3.1995**

Di navbera Amediya û Serpîlê de gerîlayên ARGK'ê êrîş birin ser konvoya hêzên dewletê. Di vê êrîşê de zêdeyî 50 leşker mirin, ji 20'an zêdetir leşker jî birîndar bûn.

Hêzên komara tirk bi darê zorê çekên gel ji wan standin û ew wekî çekên PKK'ê nîşan dan, pişt re ew çek dîsa li gel belav kirin.

Gerîlayên ARGK'ê cerdevanên Qilaban xistin kemîna xwe, di vê bûyerê de 9 cerdevan hatin kuştin.

**Kurd–A/Welatê Me**

### Konferansa Realîte ya Tirkiyeyê:

## Siyaseta Tirkiyeyê hişkegirêk e

Li Stenbolê di navbera 25 û 26'ê adarê de li hotela The Marmarayê konferansek bi navê "Konferansa Realîte ya Tirkiyeyê û Guftûgoya Azadiyê" çêbû. Konferans, bi rêberiya Partiya Sosyalîst a Yêkbûyî (BSP) pêk hat.

Danişîna yekemîn roja şemiyê saet li 09.30'an dest pê kir. Gelek kesên navdar di wê danişînê de axivîn. Di danişîna piştî nîvro de endamê komîteya navendî ya BSP'ê Atilla Aytemur wiha got: "Vêga, siyaseta Tirkiye bûye mîna hişkegirêkekê. Divê kesên wekî Îskenderê Mezin hebin. Lê vê demê ew bar li ser milê kurdan bar bûye. Birastî jî Îskenderê ku vê problemê çareser bike, ji xeynî gelê kurd ne kesek e."

Piştî vê axaftinê ji Prof. Bakir Çağlar axavî. Wî meseleya kurdî wekî meseleya nasnameya kesan bi nav kir.

Piştî Bakır Çağlar, Serokê Konfederasyona Karsazên Tirkiyeyê Refik Baydur got ku ev mesele tenê bi destê leşkeran çareser nabe. Pişt re, Mehmet Atay ( Sekreterê Giştî yê DİSK'ê), Vijdan Baykara (Berdevka Hevkariya Sendîkayên Xebatkarên Dewletê), Feqe Huseyn Sağnıç (Zimanzan û Rêvebirê Îstituya Kurdî), Engin Çimen (Parêzer), Tarık Ziya Ekinci (Parêzer), Mahir Kaynak (Profesor û endamê MİT'ê yê berê), Dr. Nail Satlıgan, Altan Tan, Talat Turhan, Ragıp Zarakolu, H.Hüseyin Çebi xeber dan.

Di danişîna bi navê "Çapemenî li ser pirsgirêka kurdî çi difikire?" de ev kesan axivîn: Seyfi Öngider, Osman Saffet Arolat (Dünya), İlnur Çevik (TDN), Ragıp Duran (Özgürlük), Gülten Kışanak (Özgür Ülke), Veysi Sarısözen (Söz). Prof. Toktamış Ateş tevî ku hatibû dawetkirin jî, nehate konferansê.

**Navenda Nûçeyan**




**Ji civînê dîmenek**

## Awireke alînegir li ser lîteraturê

# Lîteraturê li Mezopotamyayê dest pê kiriye

Lîteratur, gotineke latînî ye ku tê wateya herf, anku tîp. Di bingeha xwe de ji peyva "littera" tê. Lê beriya hebûna vê peyvê û wênenivîsiyê (Sîstema nivîsîna Someran) lîteratur, di forma çîrokên devkî, stran û nivîsarên dadî (hiqûq) de hebûye. Lê lîteratura nivîskî, bêhtirî 5 hezar salan hatiye peydakirin, ku ew li ser tore û çîrokên devkî ava bûye; koka xwe ya jîndariyê ji Mezopotamyayê girtiye.




**Çend berhem û motîvên ji Mezopotamyayê**

Çawa ku tê zanîn, dîroka lîteratura ewrûpiyan 3 hezar sal heye yan jî tune ye. Lê dîroka lîteratura me ya Mezopotamyayê derbasî 5 hezar salî dibe. Di vî warî de lêkolînên ku ji aliyê gelek lîteraturnasên ewrûpî ve hatine çêkirin nîşanî me dide ku di dinyayê de lîteratura Mezopotamyayê ya herî kevin e. Încîl, bi naveroka xwe ya piralî ve bûye çavkaniyek ji yên herî mezin ji bo ewrûpiyan, ku li ser toreya Mezopotamyayê şax daye.

Çima? Ji ber çend sedemên sereke dîroka lîteraturê li Mezopotamyayê dest pê kiriye, ew sedem jî ev in:

1. Sîstema nivîsê (wênenivîs)
2. Ola dewletmend-qebûlkirina olê
3. Birêvebirina aborî
4. Lidarxistina dewletan- kulturdewlet
5. Bazirganî- kirîn û firotin

Ji ber vê yekê gava mirov bixwaze behsa lîteraturê bike, çi lîteratur dibe bila bibe, pêşî navê Mezopotamyayê tête bîra mirov û bi dû re, çi di warê lîteraturê de û çi jî di warên din de, sê nav têne ser zimanê mirov, ew nav jî ev in:

1. Yûnanîstan, Homeros: Iliaden, Odyseen
2. Hindistan (Pirtûkên Veda, Manus- Mahabharata)
3. Çîn, helbestvan (poet), Sutung-Po.

700-s BZ. lîteratura Yûnanî; hêdî hêdî şûna lîteratura Mezopotamyayê digire. Ewrûpî ketin bin hîkariya Homerosî. Paşê Sapho bi helbestên xwe yên lîrîk hîkariyeke din bû li ser wan. Dramatîka yûnanî jî li derdora sala 400-s BZ. şax dabû, hem jî bi tragediyê, ew ji aliyê Aîskîlos, Sofokles, Eurîdus û komedî ji aliyê Arîstofanes ve hat nivîsîn. Nivîsîna van berheman bû sedema pêşketina lîteratura ewrûpî. Ji bo nimûneyê:

Eposa Vergîlîusî (esera wî ya navdar Aeneîden) wekî yên Ovîdîus, Catullîus û Horatîusî dane ser şopa Homerosî, Sapho...

**Lîteratura Yûnanî**

Homeros, wekî pêşewayê lîteratura Yûnanî ya epîk nav û deng daye. Her wisa di warê navneteweyî de jî mora xwe li dîroka lîteraturê xistiye. Berhema (esera) wî ya bi navê "Îlîaden" ji bîst û çar helbestan pêk tê. Homerosî ew li ser şerê pêncî û yek rojî nivîsiye. Berhema xwe ya bi navê "Odisseen" jî li ser jiyan û rêwîtiya (vegera) çil rojan nivîsiye. Sedemên derketina şerê Troyayê, yê bingehîn ev bû ku keyê binavûdeng, keyê Spartayê Menelaos bi Helenê re zewicîbû. Lê paşê ew ji aliyê Parîsî ve tê revandin. Ji bo ku Helena bi paş ve vegere malê û jê re jiniyê bike, çi ji destê Menelaosî hat, kir lê bi ser neket. Ji ber vê yekê, ew ordiyekê dişîne ser Troyayê; ordiya Yûnan deh salan li wir ma; çar aliyê bajêr pêçand û hemû rê girtin; alîgirên yûnanê bi ser ketin. Gernas û fermandarên Troyayê yên herî navdar ev bûn: Priamos û kurê wî Hektor

**Dijberiya Xwedêyan**

Gernas û fermandarên yûnaniyan jî ev bûn; Agamemnon, Akilles û Odissues... Homeros dide diyarkirin ku xwedeyên yûnaniyan jî tevî vî şerî dibin. Komek ji wan li ba Priamos û kurê wî û koma din jî li cem Agamemnon, Akilles û Odisseus cihê xwe digirin. Homeros, ji aliyekî ve nakokî û xirûciriya navbera mirovan û yezdanan û ji aliyê din ve dijberiya du hêzan tîne zimên. Dijberiya navbera herdu hêzan dibe sedemên şerekî dûr û dirêj.

Rêza lîteratura yûnanî ya BZ.

700-s BZ. Epîk
Eposa Homerosî: Îlîaden, Odyssee
600-s.BZ. lîrîk, Sapfo: Lesbos

400-s. Tragedî (afirandina tiyatroyê ya dilpêşewatê)
Aîskîlos: Orestien
Sofokles: Kiral Oyidipus
Euripides: Media

400-s BZ. Komedî
Arîstofanês: Ewr...

**MARÛF YILMAZ**

# Nûbihar û alfabeya kurdî




Kovara mehane ya xwerû bi kurdî, Nûbihar di hejmara xwe ya dawî de pêşniyara nûkirina alfabeya kurdî xistiye rojeva xwe. Nivîsa sergotar a Nûbiharê li ser alfabeyê ye. Di vê nivîsê de li ser pêdiviya guherînan hin niqteyên alfabeya Celadet Bedirxan tê rawestin û ji bo van guherînan jî bi mînakan hin pêşniyar hatine pêşkêşkirin. Di dawiya nivîsê de tê gotin ku gerek e eleqedarên zimanê kurdî ji bo vê mijarê dîtin û pêşniyarên xwe yên li ser alfabeyê bi awayekî nivîskî ji kovara Nûbiharê re bişînin.

Ji xeynî vê nivîsê, di hejmara nû ya Nûbiharê de van nivîsan bala me kişandin: Mersiyeyên Rojhilat, Bi Îsmaîl Göldaş re li ser Kurdistan Tealî Cemiyetî hevpeyvîn, Hêvîdarî û geşkirina roleyên me.

# REWEZ

## Nefesa dawiyê



**DILBIXWÎN**

Ji 20 Adarê ve wekî hemû biharên derbasbûyî, dîsa tank, top û F-16'yên dewleta tirk berê xwe dide başûrê Kurdistanê. Bi armanca pêkanîna xewna xwe ya 20 salan Başûr bombe dike.

Werin em careke tenê bipirsin: "Çima?" Hûn belkî dixwînin, li kêleka Mehmetcîkên li ser tankan, li ser pênûsan jî Mehmetçîkan xwe fur kirine. Çi bûye, çi qewimiye? Rola rojnamevaniyê ev e. Rojnamevanên ku ji însanan hez dikin bi vî awayî ne! We devê xwe tijî xwîn kiriye, çi hatiye serê, we! Eger di serê we de mêjî hebe hûnê bizanibin ku êdî bi operasyonan PKK nikare were qedandin. Eger PKK bi operasyon û bombakirina çiyan biqediya, weyê di kewçêra (cotmeh) 1992'an de dawiya her tiştî bihaniya. We jî, dinyayê jî berxwedana egîdên Kurd dîtin heke wisa ye, hûn ji bo çi ji ser pênûs û tifngan danakevin!"

Wisa diyar e ku dewlet dixwaze PKK û şoreşa azadiya Kurdistanê bi dest xwe ve bîne. Li gora serokwezîrê û artêşê, dîrok dîsa xwe dubare dike; di hemû biharan de vê mewalê dixwînin. Li gora wan di her êrîşekê bi hezaran gerîlayên Kurd têne kuştin û PKK diqede. Belê ji derewên wezîr, rojname û artêşê mirov difetise. Hinek dibêjin 200 gerîla hatine kuştin, hinek jî dibêjin 24 gerîla her du alî jî bi navê hikûmetê diaxifin. De werin vî kerî di vê qûlê re derbas bikin.

Şerê ku PKK dide meşandin, ne ji bo rojekê û du rojan e. Yanî bi operasyonekê naqede, ew şerekî demdirêj e. Çima?

Di derbarê vê pirsê de Serokê Giştî tiliya xwe dide ser xaleke pêwist û dibêjê: "Me PKK ji bo dîrokê, ji bo dîrokeke vekirî, ji bo azadiyê damezirand. Rola PKK'ê piştî serxwebûnê jî wê dewam bike. Me projeyeke wisa mezin daye pêşiya xwe ku hemû mirovahî bikaribe feyeyê jê bibîne. Gel çima wiha ji bo parastina vê partiyê xwe dişewitîne. Ciwanê kurd xwe dikin fedayiyên vê hebûne mezin. Gelê me niha hebûn û tunebûna xwe di PKK de dibîne. Rast e, Partiya Karkeran mirin û jiyana gelê kurd û Kurdistanê ye..."

Em axaftina serokê PKK'ê bingeh bigirin. Rastî jî wisa ye; neme tenê gelê kurd, dinya jî niha PKK'ê ji bo mirovahiyê wekî hêzeke mezin dibîne. Ji tunebûnekê, ji bêmecaliyê, di demek ku her kes ji kurdayetiyê ditirsiya, hebû. Mecal û derfetên gelek mezin ji gelê kurd re afirandin. Ji her kesî re diyar e, niha xwedîderketina li kurdayetiyê bûye rûmeteke mezin. PKK'ê kurd ji gorê derxistin, bê guman wê ji 7 saliyan heya heftê saliyan kurd bibin xwediyê PKK'ê.

Carek din ez dibêjim ev operasyon û komandoyên wehşî ku rûyê xwe bi tenî û gemarê reş kirine, meşa gelê me nikarin bidin rawestandin. Mayîna di Başûr de jî ne çare ye, ji xwe ji berê ve Zaxo, Dihok û bajarên din bi elemanên MÎT'ê hatine dagirtin, ev dagîrkirin ne tiştekî nû ye.

Em niha ji berê bêhtir dikarin van senaryoyên neviyên Osmaniyan bixwînin, ji bo ku morala xwe bilind bikin, dixwazin morala gelê me bişkînin, ev jî tu caran dewletê ji krîz û astengiyan dernaxîne. Tene riyek li pêşiya wan heye; ew ne operasyon, ne giriyê li ber mikrofon û kamerayên TV'yan (Tansu hûn dibînin dema ku dikeve tangasiyê dest bi girî dike) ne jî hêstirên di çavên dayîkên tirk de ye. Riya ku dewletê ji vê astengiyê derxîne; rûniştina bi PKK'ê re ye. Heke neyê ser vê riyê, wê ker di qulê de bifetise...!

## Di helbestên şairên kevnare yên kurd de cihê eşqê

# DIL JI MIN BIR DIL JI MIN


Hozanvanên mezin ên beriya hezar salan di helbestên xwe de tevina eşqê çawan raçandine? Di berhemên wan de eşq û evîndarî çawan bû? Seydayên bi nav û deng, zeriyên kurd çawan dîtine? Ji bejn û bal, çav, birû, bisk, enî, dêm, lêv û gerdenên wan re çi gotine? Ji bo çi zilaman ji jinan re gotine "şêre jin", "heybetpiling", "heyiva çardê", "çavbelek", "biskxelek", "enîkever", "dêmşûşe", "gerdenqaz", "kezîzer"? Ew çawa dîtine wekî keriyek (parçeyek) ji çiya, deşt, dol, newal, zozan, mêrg, çîmen, gulav û kulîlkên Kurdistanê? Ji bona çi evîndaran hevûdu qiblegeh (peresgeh) û qedirbilindtir girtine?

Bi rastî jî di dîrokê de qedr û siyaneta ku neteweya kurd daye jinan di gotinên pêşiyan de jî diyar e: "Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e!", "Jin hurmet e", "Jin diçin nav şeran, şer betal dibin", "Jina baş jîn e", "Mêr tîne, jin dipengîne" û gelek gotinên wekî wan.


Welatê kurdan dil û hinavên bûka mezopotamyayê ye. Wî warê kevnar ji mirovahiyê re malbabî û dayiktî kiriye. Dara medeniyeta Rojhilata Navîn li ser sînga wê şîn bû û çiq da. Eşq û viyanê li ser wî xakî za. Xwedêya jin a yekemîn fêkiya wî warî ye. Piraniya helbest û stranên kurdî li ser evîniyê hatine çêkirin. Di wê tevina nexşîn de rîs û kirê viyanê zêde ye. Serhatiya Mem û Zînê, ya Ferhad û Şêrînê, Zembîlfiroş û gelekên din ên navneteweyî berhemên kurdan in. Lê barbar û hovên tirk, ereb û faris fihêtkar, serşor û şermezar bin. Di sedsalên domahiyê de av li ser dara zimanê kurdî birîn, rehên wê qusandin, belgên wê werandin û çiqên wê qirandin. Xwestin ku wê çinara kevnar reh û rîşî ve hilkişînin û bînin der. 70-80 salan kurdî qedexe kirin. Zilm û zordariyeke mezin û dijwar li ser zimanê me domandin. Ger ne ji ber wê koledarî û mêtingehiyê bûya dê gelek Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî û Cegerxwîn ên din di nava gelê kurd de derketîbûna. Hem dê îro wan kedxwarên dagirker jî der heqê eşqê û mirovatiyê de gelek tişt ji bo xwe ji kurdan hîn bibûyana.

**Welatê kurdan dil û hinavên bûka mezopotamyayê ye. Wî warê kevnar ji mirovahiyê re malbabî û dayiktî kiriye. Dara medeniyeta Rojhilata Navîn li ser sînga wê şîn bû û çiq da. Eşq û viyanê li ser wî xakî za. Xwedêya jin a yekemîn fêkiya wî warî ye. Piraniya helbest û stranên kurdî li ser evîniyê hatine çêkirin. Di wê tevina nexşîn de rîs û kirê viyanê zêde ye. Serhatiya Mem û Zînê, ya Ferhad û Şêrînê, Zembîlfiroş û gelekên din ên navneteweyî berhemên kurdan in.**


Melayê Batê


Meleyê Cizîrî


Ehmedê Xanî


Cegerxwîn

Ezê di vê nivîsê de tenê gotinên 6 hozanvanan bi çend rêzikên kurdî pêşkêş bikim. Dîtinên wan ên di beşa eşq û evîndariyê de. Ez bidim xuyakirin, da ku xwendevanên delal firehî û kûrahiya wê di nava wêjeya kurdî de bibînin. Hem wekî seydayê Xanî gotî:

Da xelq-i nebêjitin ku: "Ekrad
Bêmarîfat in, bêesl û binyad

Hem ehlê nezer ne bên ku: "Kurmanc
Işqê nekirin ji bo xwe armanc

Elî Herîrî di sedsala 11'an de jiya ye. Herîr, navê gundî wî ye. Kurdê navenda Zagrosan, hezar salan beriya niha ew eniyên di bin zilfên reş de çawan wekî tava rojê û heyva rengîn dîtine:

Eniya binûr zilf têne ser
Rengîn dibin şems û qemer
Reşmar ji perdane nedar
Li e're'ra yarî dikin

Ê di nava hemdemên xwe de herî sofî Melayê Bateyî di qirnê 15'an de jîna xwe li devera Hekariyê borandiye. Gundê Bate, li kêleka zozanên meydana Zengil û Feraşîna navdar e. Ew herêm, ji mêj ve kevnewarê berîvanên kezîzer e. Wî jî nikariye xwe dûrî eşqa zozanan bigire. Di serhatiya Zembîlfiroş de xudanê memikên mîna şekir û sêvan çawan dide axaftin:

Lawiko, were ser şekir û sêvan,
Wan bimêje bi dev û lêvan,
Sîng û berê min ji te ra meydan,
Li ser siwar be bajo heyran

Bêguman yê dîwarê eşqa kurdî bi tîpên zêrîn ve nijinî, yek jî Feqiyê Teyran e. Wê çaxê bajarokê wî Miks li ser Mîrê Hekariyan bû. Jîna wî jî di sedsala 14'an de derbas bû. Di helbesta "Dîlberê" û "Serhatiya şêxê Sen'an" de xîmê evîndariya kurd kûr avêt. Di helbestên wî de aşiq bûne "wêran", "malxerab". Keçên dilkevir bûne "kafir", xort "sotin" bûne "rijî", şêx ji terîqetê derketine.

Li jêrê çarikek helbesta "Dîlberê", yek jî ya "Şêxê Sen'an" heye:

Tu bi qesta min dikujî
Ey kafira dil nasojî
Gelek sotim, kirim rijî
Wêran ezim malim xerab.

Hem nû kirim, hem bad kirim
Ku wê ez îsyan kirim
Ji wê terîqetê der kirim
Kafir kirim bêmirwetê.

Qet dibe ku Melayê Cizîrî ji aliyê eşqê ve ji zozaniyan li paş bimîne. Kurdê Botanê ye. Di bajarê wî de deşt û çiyayên Kurdistanê mil didin hev. Meskenê Memê Alan û Zînê ye. "Şêx û şengê, Zuhre reng", "gerdenşepal", "bisksemal", "heybetpilinga" çawan "sînga wî kirine armanca tîra." Binêrin ka seyda ji kê re hez dike xulamtiyê bike.

Xoş xeramê, ez xulamê
Nazikê şîrînkelamê
Tutiya eywanmeqamê
Dil ji min bir, dil ji min.

Li vir jî temaşe bikin Shakespeare kurdan Ehmedê Xanî. Di zindana Cizîrê de Memo û Zînê çawan dide axaftin. Zîna "perwane" û Memoyê "şem" ji hevûdin re çi dibêjin. Bizanin ku ji bo kurdan eşq çawan ji padîşahî û qiblegehiyê biqedirtir e.

Perwaneyê go: "Tu padîşah î"
Şem'ê wiha go: "Tu qiblegah î"

Di sedsala me de pîrê hozanvanan Cegerxwîn ji bo eşq û evîndariyê çi dibêje? Ezê ji wê deryayê tenê dilopekê jî xwendevanên hêja re bikim diyarî.

Di rojên şahî û cejnê, binêrim ez li wê bejnê,
Bi hev re em herne dansê, tu padîşahê rinda bî,

Keça zana û jêhatî, bibe partî-demoqratî,
Bera dîsa tu şêrîna dilê xorta û seyda bî.

Belê, wî jî keça kurd kire "padîşahê rinda" û şêrîna dilê xwe...

**Î. CÛLEMÊRGÎ**

www.arsivakurdi.org

# Roviyê fênek û gurê bale

Carek ji caran, rehmet li dê û bavên guhdaran, cenet nebe para cendirme û talîmdaran.

Gurekî keftarî û roviyekî şareza hebû. Di rojeke payîzê de rovî bi hîlebazî gihîşte gur û di navbera xwe û wî de peymanek danî. Gur û rovî bûn destebirayên hev.

Bi vî awayî roj çûn heftî hatin, heftî çûn meh hatin. Herdu ji hev neqetiyan. Bi hev re çûn geşt û seyranê. Bi hev re dixwin û vedixwin. Rojekê dîsa wekî her caran bi hev re dertên seyranê. Çi bibînin; li hindava wan, li quntara çiyê keriyek pez diçêre. Şivan jî bêkuçik e.

Çavên rovî wisa dibe ku ji cihên xwe derên. Ên gur jî diçûrisin. Gur nema tebitî û xwe avête pêş, got: "Birayê rovî, tu li birayê xwe binihêre, ka ezê çi bikim?"

Rovî jî wiha deng lê kir: "Baş e birayê gur. Ez li te mêze bikim. Bawer bike ku tu çend heban biavêjî erdê ezê zehf kêfxweş bibim."

Gur hew xwe ragirt. Kete rê. Gur, gurekî keftarî ye, gelek caran pez xeniqandine û zane ku li pezê bêkuçik xistin çiqas hêsan e.

Li hawirên xwe baş fekirî (mêze kir) ku şivên xwe li ser kulav dirêj kiriye, di xew de ye. Gur dirêjî pêz kir, bi rihetî çar mihên qelew mirar kirin. Rovî li jor dibîne ku gur çi tîne serê pêz. Li bayê bezê xwe gihande cem gur. Bi hev re mih kişandin birin, qulên xwe.

Mih gurandin, postên wan li ber destên xwe hiştin. Qelî çêkirin û kirin kûpan û ew veşartin.

Roj çûn meh hatin, meh çûn demsal hatin. Wext reşemî (sebat) ye. Bezên wan heliyane, eyarên wan li hestiyên wan fireh bûne.

Qeliya wan hate bîra rovî. Rovî bêyî dek û dolaban nikare debarê bike. Kete dû hîleyan ku çawa karibe bêyî gur qeliyê bixwe. Deka xwe di serê xwe de sewirandibû. Qerar da ku wê pêk bîne. Ji nişka ve dertket serê darê û dest pê kir:

"Haaa...!"

Gur: "Çi bû birayê rovî?"

Rovî: "Birayê gur, ji gund bangî min dikin, dibêjin ku ji malekê re zarokek çêbûye û dixwazin ez navekî lê deynim. Va ez diçim tu hay ji xwe hebî ha."

Gur: "Xeman neke birayê rovî. Ezê hay ji xwe hebim. Lê tu navekî xweşik li zarok deynî."

Rovî bi rê dikeve. Diçe cem kûpê qeliyê. Kûp derdixe. Dikeve serê, têr dixwe. Tê cem gur. Gur jê dipirse: "Te çi nav lê danî, ka ji min re bibêje."

Rovî: "Min navê "devvekirî" lê danî."

Gur: "Devvekirî!"

Rovî: "Erê, ma ne xweş e?"

Gur: "Çawa be, îdare dike".

Çendek dibihure. Rovî tamijiye, diqilqile. Di cihê xwe de nasekine. Dîsa dertê serê darê û ji nişka ve dibêje: "Birayê gur, ev çi ye heyra?"

Gur: "Çi ye birayê rovî?"

Rovî: "Wele dîsa bangî min dikin. Zarokekî din jî çêbûye. Dixwazin ez navekî li wî jî deynim."

Gur: "De tu zanî birayê rovî."

Rovî dîsa gihîşte mirazê xwe. Çû ba kûpê qeliyê jê xwar heta nîvî bû. Zivirî cihê xwe. Gur pirsî: "Te nav lê danî?"

Rovî: "Birako wele min navê "Nîvco" lê danî."

Gur, ji dekên rovî fêm nake. Rovî bêyî hevalê xwe qeliyê dixwe.

Di ser de demek derbas dibe. Dinya sar e. Gur çermê ber xwe dialêse. Lê rovî hînî qeliyê bûye. Tama qeliyê û ya çerm dibe yek? Rovî rabû dîsa dest bi fênên xwe kir. Derket ser darê û qariya. Gur jê pirsî ku çima diqare. Rovî lê vedigerîne: "Lo heyra dîsa bangî min dikin, dibêjin min ku ez navekî li zarokê wan deynim."

Gur: "Tu çima naçî? Dilşikestin nabe di navbera me û gundiyan de hebe."

Rovî vê carê qelî qedand. Binê kûp alast. Rabû kûp tije ax kir û dev lê girê da. Pişt re hate cem gur. Gur li ber xwe neda gote rovî: "Te nav lê danî?"

Rovî: "Min navê "Alastok" lê danî. Çawan e?"

Gur: "Çi navên xerîb li cem te hene lo!"

Meha reşemiyê qediya. Adar bi ser wan de hat. Gur ji destpêka zivistanê ve çermik alastine. Pir qels bûye. Lê rovî bi xwe roviyê berê ye.

Rojekê çawa dibe qelî dikeve bîra gur. Ji cihê xwe rabû çû ba rovî û bi dilekî safî ji rovî re got ku payîzê qelî çêkiribûne, êdî dema xwarina wê hatiye.

Rovî qet li xwe danayne. Wekî ku tiştek nebûbe. Heq da gur ku herin qeliyê derînin. Çûn kûp deranîn. Dev vekirin, lê mêze kirin ku tije ax e. Gur û rovî ketin qirika hev. Bi sond mondan jî gur bi rovî neda qebûlkirin. Rovî ji gur re gote ku ewê qûna xwe bidine ber tavê. Ya kê dohn bide wî qelî xwariye.

Herdu li ber devê şikeftê pişta xwe dan ber tava tûj. Gur di xew de çû. Rovî bi qûna wî de mîst. Rovî gur ji xew rakir û gote: "De rabe, binêre bê çawa dohn ji qûna te dikişe." Gur bala xwe didê ku rast e. Dike nake xwe ji lepên rovî nafilitîne. Di dawiyê de rovî qerar da ku gur bibexşîne û jê re wiha got: "Ez vê carê te dibexşînim birayê gur. Lê careke din bila tiştekî wiha çênebe."

Gur bi vê qerara rovî şad bû. Di dilê xwe de pê serbilind bû.

Çend roj bi şûn de, dîsa bi hev re derketin gerê. Bi rê de bû mirçe mirça devê rovî. Gur ji rovî pirsî ku çi dike. Rovî gote ku ji birçiyan çavên xwe derxistiye û dixwe. Pêşî gur bawer nekir, lê roviyê lepek pê da bawerkirin. Gur jî, ji rovî xwest ku çavê wî derxe, ji bo ku ew jî çavên xwe bixwe.

Rovî çavekî wî deranî û avête devê xwe ji erdê jî bişkûlek hilanî û avête devê gur.


Gur: "Çiqas tal bû birayê rovî!"

Rovî: "Wisan e. Lê ez bawer dikim çavên din wê ne tal be. Lewre em hêj hînî çavan nebûne."

Bi rê de dimeşiyan. Rovî nedixwest ku gur çavên wî bibîne. Çavên xwe nîşanî gur nade. Qederek di navê de diçe, dîsa dibe mirçemirça devê rovî. Gur jê dipirse ka çi dike. Rovî dibêje ku çavê xwe yê din jî derxistiye û dixwe û ji yê din bitehmtir bûye. Gur ji rovî dixwaze ku çavê wî yê din jî derxe û ew jî yê xwe bixwe. Rovî rabû çavê wî ji cih deranî û ew bêçav hişt.

Rovî hîn jî li dû fên û fûtan e ku bîne serê gur. Ji gur re dibêje ku ew bibêje çi divê ku bi ya wî bike. Rovî biçav e û gur jî bêçav. Rovî wî dibe di terazinekî de tera dike, diavêje xwarê û li dû wiha dibêje: "Eger bêhiş û baleyên (ehmeqên) wekî we nîn bin, ji şarezayê wekî me re nan nîn e."

**DILGERM NEMIRD**




Xebatkarên hêja yên Welatê Me! Ez keçeke kurd im. Ez 12 salî me. Malbata min li Midyadê (navçeya Mêrdînê) rûdinin. Ez li dibistana navîn dixwînim.

Ez Newroza we û ya gelê kurd pîroz dikim. Min wêneyek çêkir û ji we re şand. Di vê wêneyê de şahiyên Newrozê dixuyin. Ez dixwazim hûn vê wêneya min di "Welatê Me Zarokan" de biweşînin. Ger hûn biweşînin ezê gelekî bextewar bim. Hûn neweşînin jî canê we sax be.

Di dawiya nameya xwe de ez ji zarokên Kurdistanê re silavên germ dişînim.

**Zîna Torî**




Xwendevanên hêja û delal. Li jor du wêneyên ku ji aliyê du xwendevanên me yên biçûk ve hatine çêkirin, dixuyin. Ji xeynî wêne, em nameyê Zîna Torî jî bi wêneyê wê re diweşînin. Em ji Eyüp Demir û Zîna Torî re spas dikin û dibêjin bimînin di xweşiyê de.

**MAMOSTE ZOZAN**

www.arsivakurd.org



# JI WELATÊ ME

MAZHAR GÜNBAT

## Encama Anketê

Xwendevanên hêja! Esas, me niyet hebû ku em heftiya çûyî li ser encama anketê hin agahiyên giştî bidin we. Feqet li weletekî mîna Tirkiyeyê mirov nizane wê kengê çi biqewime û çi tiştê din bikeve pêşiya karên li ber mirov. Ji be ber lîstikên dewletê yên li ser cejna Newrozê û îşgala ku artêşa tirk li Başûr pêk anî, di vê quncikê de cih ji agahiyên li ser anketê re nema.Her çi em hewl didin daxwaz û hêviyên xwendevanên bersiv dane anketê bînin cih, hinek bi derengî be jî lazim e çend gotin jî li ser profîl û daxwazên xwendevanên Welatê me bên kirin.

Weke tê zanîn, di hejmarên 12, 13 û 14'an de bi niyeta tesbîtkirina daxwazên we û kemasiyên rojnameyê, me rûpela 14'an ji anketekê re veqetandibû. Ji bersivên ku ji bo pirsên di anketê de hatine dayîn, hin taybetî û daxwazên xwendevanên Welatê Me:

**3500 xwendevan**

Ji 3500 xwendevanên Welatê Me 214 kesan bersiv dane anketê. Li Ewrûpayê hejmara xwendevanên rojnameyê li nêzîkî 700'î ye. 25 bersiv hatin ji Ewrûpayê, yanî %4. Li Tirkiye û Kurdistanê 2800 kes welatê me dikirin. %8'ê wan yanî 189 kes ji wan anket ji me re şandin.

Xwendevanên Welatê Me ji aliyê meslekî ve pirr rengîn in. Ji her meslekên ku ezê li jêr binivîsim li dora 100- 150 kes rojnameyê dixwînin. Ew bi giştî xwediyê van sifeta ne: Xwendekar, karker rêncber, bijîjk, parêzer, gundî, karmend, betal, karsaz, esnaf, mamoste, şoreşger, rojnamevan, hunermend, teqewît û hwd.

Em dikarin bibêjin ku hejmara van xwendevanên me pir nêzîkî hev in. Ji aliyê temenê xwe ve %80'yê wan ciwan in (18-35 salî).

Her yek ji wan rojnameyê bi 4 kesên din didin xwendin. Ev tê wê maneyê ku hejmara kesên Welatê Me dixwînin li raserî 15 hezaran e. Helbet pêwist e ku em bi vê hejmarê qayîl nebin. Xwendevanên Welatê Me %90 zimanê wan kurmancî ye. Yên din jî kirdkî û jî soranî ne. Li dora 20 kesî jî xwendevanên me yên biyan hene wekî: ingilîz, fersiz, tirk, ermen, alman, norwecî û amerîkî.

**Siyaseta weşana rojnameyê**

Rêjeya ecibîna siyaseta weşana rojnameyê % 90 e. %6 xwendevanên me rojnameyê pir tûj û subjektîf dibînin, % 4 dibêjin Welatê Me weşaneke reformîst e. %75'ê wan rojnameyê her hefte birêkûpêk dixwînin, yên din bêrêkûpêk naxwînin an jî carinan dixwînin. %50'yê wan rojnameyê ji serî heta dawiyê (ji xeynî falê) dixwînin. Di welatê me de piştî falê beşê herî hindik tê xwendin nameyên xwendevanan e. Ji sedî 70'yê xwendevanan dibêjin ku falê naxwînin.

Nivîsên ku xwendevan dixwazin cihê wan fireh be nûçe ne. Ev rêjeyên min li jor dan bi giştî reqemên glover in, li ser detayên reqemî ez nesekinîm. Çi daxwazên xwendevanên me hene bi giştî emê hewl bidin xwe ku wan pêk bînin.

**Fiyeta Welatê Me**

Ji roja Welatê Me derketiye heta vêga fiyeta kaxez û her cure pêdiviyên rojnameyê % 100 zêde bû. Fiyeta Welatê Me hê jî eynî ye. Feqet, mixabin, ji bo ku Welatê Me karibe weşana xwe bidomîne li hemberî zêdebûna fiyeta her tiştî, ew jî di heftiya pêşiya me de bi îhtîmaleke mezin wê fiyeta xwe bike 35 an jî 40 hezar TL.


**WELATÊ ME**

Rojnameya Hefteyî
**(Haftalık Gazete)**

Li ser navê
ROZA Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
**Aynur BOZKURT**

...............

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
**Mazhar GÜNBAT**

...............

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazıişleri Müdürü)
**Metin AKSOY**

...............

Berpirsiyarê Nûçeyan
(Haber Sorumlusu)
**Suut KILIÇ**

...............

Redaktor
**Sami TAN**

...............

**NAVNÎŞAN (Adres)**
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

**TEL–FAX**
– 245 29 91

**ÇAPXANE**
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

**NÛNERÎ**
(Temsilcilikler)

**Suriye–** Jan Dost
Fener Rojbiyanî
**Berlin–** Silêman Sido
Sîrwan Reşîd
49-30-69 00 26 95
**Bonn–** Ahmet Baraçkılıç
49-228-66 62 49
**Hannover–** Selîm Biçûk
49-5721-813 60
**Hamburg–** A.Hekim Gülsün
49-40-40 33 88
**Munchen–** Mahmut Gergerli
49-871-670 884
**Badenwurttenberg–**
A. Rahîm Ayaz
49-75453258
**Swed–** Amed Tigris
46-8-740 69 81
**Amsterdam–** Cotyar Zaxoy
31-20-613 07 66
**Paris–** M.S. Ayçiçek
33-1-48000401
**Atîna–** Ferhan Zêbarî
30-13634905


# Pirserîtiya alfabeya me

Ez xwendevanekî rojnameya welatê Me me. Derketina vê rojnameyê dilê me xweş kir û serê me jî bilind kir, lewre piştî girtina rojnameya Welat em wekî sêwiyan mabûn. Ez di vê baweriyê de me ku ev rojnameya hanê wê valahî û kêmasiya di vî warî de tijî bike. Em xwedevanên Welate Me şertên ku em tê de çiqas giran dibin bila bibin, bêrawestan berdewama weşana rojnameya xwe dixwazin. Û ez hemû berpirsiyar û xebatkarên rojnameya Welatê Me ji ber ku diyariyeke wisa biqîmet pêşkêşî me kirine spas dikim.

Rastnivîs û Rêziman

Min divê hin dîtin û ramanên xwe yên di der mafê alfabê, rastnivîs û rêzimanê de bînim ziman. Bi dîtina min hinek kêmasî û çewtî di van mijaran de hene:

1–Pêşî dive duserîtiya ku di nava alfabe ya Latînî ya kurdî de heye ji holê bê rakirin. Hin weşan û nivîskarên kurd dixwazin li gorî xwe alfabekê deynin an di hin şaşî û çewtiyên xwe de israr dikin. Li ser vê yekê cudahiya ku di navbera weşanên bi kurdî de li ser bikaranîna tîpên "ı,i" û "i,î" yan de heye divê ji holê bê rakirin. Em welatparêzen gelê kurd tiştekî wisa naxwazin. Lewre îro li kîjan alfabeya neteweyî bê nêrîn rewşeke wisa nayê dîtin. Em naxwazin ku dijminên me bêjin: "Li wan binêre hêj alfabeyeke wan a sererast tune ye" û kenê xwe bi me bikin.

2– Li gorî ku hin zimanzan û rewşenbîrên kurd dibêjin; li ba dilê min jî her çiqas alfabeya latînî ya ku tê bikaranîn ji alfabeyên din ( wek erebî... hwd) çêtir be jî tê de jî hin kemasî hene. Û hemû peyvan tekûz û bi rêkûpêk nayîne ziman, minak: Wek peyvên kerr, çal, pan, panî, patin...û hwd. Ev peyvên han mîna ku di axaftinê de tên gotin, di nivîsê de wisa nayên ziman. Ango dinivîsîn û axaftinê de kemasî çedibe. Bi dîtina min ku piştî tîpa peşî "h" bikeve nava peyvê ango peyv bi vî awayî; kher, çhal, phan...bêne nivisîn wê cudatî kêmtir bibe. Lewre divê armanc, nêzîkahiya zimanê nivîskî bi ya axaftinê re be. Û dive çi deng û peyvên di zimên de hene bi hêsanî û tekûz werin nivîsin, di alfabeyê de werin temsîlkirin. Ne mafê kesekî ye ku ziman têxe nava kirasekî teng û kurt, bi vî awayî ziman bikesixîne, xera bike û ji xwezahiya wê dûr bixîne


3– Li gorî nêrîn û lêkolînên ku min kirine, di axaftinê de peyvên ku bi dengdêra "Û" diqedin gava bêne tewandin an bi peyveke din ve tên girêdan, piştî wê dengdêrê, tîpa dengdar "W" ê di nava herdu peyvan de cih distîne minak: Weke rûwê min, parsûwê min, parsûwê şikestî... Tê bikaranîn, lê di weşanê we de di şûna wê tîpê de qertafa "y" tê bikaranîn. Daxwaza min rastkirina vê çewtiyê ye.

**Hikmet Dağlı/Amed**

**MEHMET ŞEN**

Di 26.3.1994'an de li Entebê bi hovîtiyeke nedîtî hate kuştin. Bi can, bi xwîn Em bi we re ne ey şehîdên Kurdistanê.

***Pîreka wî Nuray Şen***




## AGAHIYÊN ABONETIYÊ

**Min Welatê Me Divê**

| | Li Hundir | Li Derve |
|---|---|---|
| ☐ 3 Meh | ☐ 400.000 TL | ☐ 35 DM |
| ☐ 6 Meh | ☐ 800.000 TL | ☐ 70 DM |
| ☐ 12 Meh | ☐ 1.600.000 TL | ☐ 140 DM |

**Bedelê Abonetiyê ez radizînim**

**Li Tirkiyê –** Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Hesap No: 1100264–1

**Li Derve –** Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507–3

**NAV Û PAŞNAV** : ..............................
**NAVNÎŞAN** : ..............................
..............................

**Navnîşana Welatê Me**
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
**Tel–Fax:** 2491344 – 245 29 91


www.arsivakurdi.org



## Bîranîna gerîlayekî ARGK'ê, bi Mahsun Korkmaz re

# 'Gerîlayên jîr nakevin kemînên dijmin'

Cara pêşî di sala 1985'an de piştî ku em ji kemîneke dijmin filitîn, min rêheval Egît dît. Li çiyayê Xelîlan ez rastî wî hatim û pê re peyivîm. Axaftina me li ser kemînên dijmin bû. Rêheval Egît wiha digot: "Ew gerîlayên ku dikevin kemînên dijmin debeng (ehmeq) in."

Piştî hingê gelek carên din em rastî hev hatin. Grûba min û ya wî ji hev cihê bûn. Car caran me grûbên xwe digihandin hev û bi hev re jî livbazî pêk dianîn.

Dijmin zehfê caran nedixwest xwe nêzîkî grûba Egît bike.

### Gerîla bêplan nabe

Egît kumandarekî pir fedekar bû. Dema hevalên ji grûba wî ji bo karekî diçûn gundan û dizivirin, ji ber ku diwestiyan, Egît ji pêl wan ve nobet digirt. Lê hevalên wî nedihiştin kumandarekî mîna wî ji ber wan ve li cihê nobetê bisekine.

Rêheval Egît her tim moral û cesaret dida me. Bi axaftinên xwe girêdana me ya bi partiyê ve xurtir dikir. Di dema xwarinê, meşê, rûniştinê û hwd. de bêrawestin wî em perwerde dikirin. Li ser giringiya rêkûpêkiya gerîla wiha digot: "Eger gerîla bêplan û bername be, ne dikare bilive, ne jî livbaziyan bike." Ji bo tevgereke herî biçûk jî wî her tim hesabê xwe dikir, ka emê kengê emê dest bi tevgerê bikin, kengê vegerin niqteya xwe. Bi kurtî ji bo her gavî wî hesabên hûr û kûr dikirin. Dema di wextê ku me qewlê xwe kiribû de yek negihişta cihê xwe, dereng bima, hesab jî wî kesî dipirsî, li ser sebebên derengmayînê disekinî û ji bo ku careke din tiştekî wisa neqewime sebebên kêmasiyan tesbît dikirin.

### Wezîfeya pêşikvanî

Şevekê, dîsa em di rêzê de dimeşiyan. Ez pêşikvanê grûbê bûm. Ji ber ku ez pir zû dimeşiyam û min li pey xwe ne nihêrî, ji nişka ve min dît ku ez ji grûbê qetiyame û winda bûme. Piştî du saetên din dema ez rastî hevalan hatim, Egît ji min re got: "Tu pêşikvan bî jî, divê tu bi grûbê re hereket bikî û zanibî ka barên hevalên te sivik in, giran in; mafê te tune tu ji herkesî bixwazî ku mîna te bimeşin." Ji ber vê kêmasiya min wî wezîfa pêşikvaniyê da hevalekî din û heta sê rojên din nehişt ez di pêşiya hevalan de bimeşim.

Di 22'yê reşemiya 1986'an de em li çiyayê Gabarê di şikeftê de bûn. Ji ber baranê, em nedimeşiyan. Di wê navê de me ji nûçeyên radyoyê bihîst ku hevalan li Ewrûpayê meşên protestoyê û livbazî pêk anîne. Li ser vê nûçeyê rêheval Egît û Harun wiha peyivîn: "Hevalên me li Ewrûpayê livbaziyan li dar dixin, lê em li vê derê, li serê van çiyayan, bi van îmkanên fireh livbaziyan pêk naynin! Ji niha û pê ve emê jî bêrawestin livbaziyan pêk bînin."

Hevalê Egît nedihişt ku heval serê sibê ji ber xwarinê çixarê bikişînin. Digot: "Pêşî qet nebe gezek nan bixwin, dû re bikişînin." Wekî din nedihişt kesên ku rûyê xwe neşûştibe, xwarinê bixwe, helbet eger av hebûya ev şert datanî pêşiya me.

Ji bo wî şehîdên Kurdistanê pir birûmet bûn û dixwest riya wan bişopîne. Li ser şehîdan ev tişt digotin: "Ji pêşengên PKK'ê Rêheval Hakî, Mazlum, Kemal û Hayrî şehîd ketin, ezê jî rojekê bibim şehîd, hingê hûn şûna min dagirin û vê wezîfeya min bînin cih."

### Leşker û mişk û arvan

Wî dixwest her tiştê xwe bi hevalên xwe re par ve bike. Çixareyeke wî hebûya dikaribû bi hemû hevalên xwe re par ve bikira. Di meha reşemiya 86'an de, em pêvajoya heft rojan bêxwarin man. Ne xwarin ne jî çixareya me mabû. Tenê di qutiya Egît de têrî çixareyekê titûn hebû. Em li cihekî rûniştin, heval Egît ji wê titûna dawî çixareyek pêça û xwest ku her heval jê du kulman (bêhnan) bikişîne, hevalan qebûl nekirin û xwestin ku ew hemû çixareyê bi tenê bikişîne, lê Egît jî qebûl nekir û dawî ji ber ku hevalan nexwest bikişînin, wî jî çixare nekişand. Dora rojê hemû hevalan bi hev re ew çixare kişandin; her yekî ji wan du nefes. Di nav wê rewşa xerab û tunehiyê de jî morala me pir bilind bû.

Di dawiya meha reşemiyê de, me hinek arvan peyde kiribûn. Em li Çiyayê Reş bûn. Li vî çiyayî me gelek arvan û xurek veşartibû. Dema leşkerên tirk û mişkan erzaqên me didîtin dixwarin. Mişk dîsa ketibûn nav arvanê me û pîsîtiya xwe xistibûn nav. Me xwest em paqij bikin lê ne mumkûn bû. Hevalê Egît got: "Tiştek bi we nabe, arvan berdin ser şûtikên xwe û bêjing bikin." Me jî wisa kir.

Hingê hevalên Egît û Harun der barê xwarinê de wiha gotin: "Kengê em welatê xwe rizgar bikin, emê jî xwarinên xweş bixwin, lê eger em wê rizgar nekin, emê birçî bimînin."

### Gerîla û bêçixarebûn

Di vê navê de dîsa çixareya me nemabû. Hevalekî me xwest ku ji pelên daran çixare çêbike û bikişîne. Rêheval Egît hêrs bû û mudexele kir: "Eger em niha nikaribin li ber xwe bidin û vîna xwe kontrol bikin, dema sibe dusibe em bikevin zindanan gelo emê çawa li ber xwe bidin." Hingê hevalan jî pelên daran nekişandin.

**Çavkanî:** Hejmara Taybet a Serxwebûnê ya 91'an.

### EGÎT

Egît biheybet
Bejn û bal birext
Dijminê dijmin
Rêberê milet

Baz û pêlewan tu şerê kurdan
Dara azadiyê bi xwîna xwe çand

Em sondxwarî ne bi wê xwîna te
Emê bidin pey rêç û şopa te
Li ber çavan e şan û rengên te
Emê bistînin tol û heyfa te

Dilê te ji pola gurçik hesin e
Dijmin li hember te nikaribû bisekine
Te tirs berdabû, dilên dijminan
Navê te yî giran daha mezin e

Tîp û komên te herdem li pêş bûn
Dijmin xayîn bûn, pîs û qeleş bûn
Panzdehê Tebaxê li wan rû geş bû
Agirê şoreşê li Erûh xweş bû

Egît biheybet
Bejn û bal birext
Dijminê dijmin
Rêberê milet

Baz û pêlawan, tu şerê Botan
Dara azadiyê bi xwîna xwe çand.

**Çavkanî: Artêşa Me, Dilgeş 2, Weşanên Hunerkomê 23**

*elinewêrek*



